

WELAT

66

SAL: 2

4 - 10 Gulan 1997

BUHA: 75.000 TL



Hevpeyîn: Ferhat Tunç
Ez bi stranê qetîama
Dêrsimê mezin bûm

Rüpel 8-9

Baran Rizgar li ser
tewandina navan di
kurmancî de, radiweste

Rüpel 4-5

Nûçe:
PKK bûye sembola
nasnameya kurdî

Rüpel 16

NAVEROK



Zülküf Kışanak: Keyna Seyid Riza Shahid Yadigar Doğan

6



Bêzîr Kobanî: Hinek wêne ji helbesten Melayê Cizîrî

10



Selih Taşkesen: Divê Heskîf bê jiyandin

11

Ji Xwendevanan

EZ weki ciwanekî kurd, cejna hemû rewşenbir û rojnamevanen kurd pîroz dikim. Em bi jiyankirina rojnameyên xwe dest bi çalakiya xwendinê dîkin. Tu kes nikare dengê aşî û azadiya gelê me qut bike. Ji bo gelê kurd daxwazîya me, ewe ku rojnameya xwe bêdeng nehêlin, lê xwedî derkevin; cîma nakirin gelo. Dewleta dagirkir li hemberî xwendina bi zimanê geleki ku xwes e, bi nijadperestî û dagirkirî dixwaze astengiya derxe..

Giring e ku em firsetdê nedînê. Serokê RP Necmettin Erbakan dibêje, ku emê imam Xatîpan li Kurdistanê damezirînin. Bila gelê me li hemberî sofi rawestin û cüyina dibistana Îmam Xatîb berteref bikin û neçin hinê wî, qaf qirêjîyê nebin. Daxwazîya min ji gelê kurd ev e.

ERDAL DÜRRE

EZ bi alikariya bavê xwe hinî xwendina zimanê xwe bûm û min ev name nivîsand. Ez çirokên we pir diecibinim, ez dixwazim hûn rüpelekî rojnamê ji me zarokan re vejetînin. Ez yanzdeh salî me. Ez diherim dibistana seratayî û ez xweg bi kurdi dixwinim. Birê min Servet, xuşkîn min Gulbarîn, Gulbarîn ji bi kurdi dixwinin, ew ji Azadiya Welat dixwinin û silava li we dîkin. Heke em mezin bibin emê şûna we vala nehêlin. Ji bo xebata we spas dikim. Ez dixwazim zarokan kurd gişk hinî xwendina bi zimanê xwe yê zikmakî bibin.

LEZGÎN DEMIRCI



Stratejiya nû ya artêşa tirk

SAMÎ TAN

Serkanîya Giştî ya Artêşa Tirk car bi car civînê agahdariyê pêk tîne. Di van civînan de derdorênen cur bi cur têr agahdarkirin li ser bîr û ramanê fermî yên artêşê. Hefteya çûyî roja 29'ê avrêlê ji bo qelemşorê çapemeniyê civîneke bi vî rengî hate lidarxistin.

Di vê civînê de bi qasî ku di rojname û televîzyonan de hatiye daxuyandin, tiştên gelekî balkêş hatine gotin. Ev tiştên ku hatine gotin, idayê artêşê yên di warê qelsketina PKK'ê de jî derew derdixin. Li gorî gotinan artêşa tirk strajejiya xwe guhartiye. Ewê ji berevaniya li hemberî hêzên derveyî zêdetir giraniyê bide ser têkoşîna li dijî hêzên dijber-ên hundîrîn. Li gorî generalên tirk sersariya li hemberî PKK û hêzên İslâmî wê bibe sedema xwekuştina dewletê. Serê li hemberî hêzên hundîrîn ên dijber di serî de tevgera kurd, şerê hebûn û nebûnê ye ji bo dewleta tirk.

Di vê civînê de generalên tirk dâne zanîn ku her roj 4 milyon dolar li

şerê qirêjî diçe. Her wiha generalên tirk yekemîn car bi awayekî fermî da zanîn ku wan ji bo kêmkirina piştevaniya ji bo PKK'ê gund valakirine. Generalên tirk dîtinê xwe yên bi rengê "têkoşîna bi terorîstan re karê me ye, lê têkoşîna bi terorê karê dewletê ye." dubare kirin. Li gorî generalên tirk artêş di şer de serkeftî ye, lê saziyên din ên dewletê peywir xwe neanîne cih, lewre jî PKK bûye hêzeke navneteweyî. Di vê civînê de li ser dewleten ku "alîkariyê didin PKK'ê" jî hatiye rawestîn, li ser pirsa rojnamegeran hate gotin ku heke pêwist be divê dewleta tirk li dijî van dewletan dest biavêjin çalakiyên leşkerî jî.

Di gotinê generalan tiştê balkêş ev'e ku ew jî bi awayekî sergirtî dipejîrinin ku gelê kurd ne bi wan re ye. Li ser pirsa rojnamegerekî hatiye gotin ku heta piştgiriya gel neyê standin, di şer de serkeftin çenabe. Lê agahiyeke ku general daye jî nîşan dide ku ew nikarin bi vî awayî pişte-

vaniya gelê kurd bistînîn. Tê idiakirin dewletê heta niha 32 hezar gerîla bêtessîr kirine, watê hinek ji wan hatine girtin û hinek ji hatine kuştin. Heke malbatê wan kesan bi tenê bê hejmartin jî, wê bê dîtin ku dewletê gir û nîfrîn bi sedhezaran mirovî qezenc kiriye. Eger em kesen ku hê li çiya ne tevî maibatê wan, mirovîn gundêne wan hatine şewitandin, kesen bi faşî meçhûlan hatine kuştin, yêne ku işkence dîtine jî bikin ser wê hejmarê, bi milyonan mirov dêrdikevin rastê. Ew yek jî dide zanîn ku dewlet tu car nikare di vî şerî de bi ser bikeve.

Jixwe gelek kesen ku pir hindik ji rewşê haydar in jî didin zanîn ku pirsgirêkên bi vî rengî, bi kuştinê çareser nabin. Lê generalên artêşa tirk li aliyekî didin zanîn ku wan hêza PKK'ê daxistiye radeya sala 1984'an, ji aliyê din bi deh hezar leşker, tîm û cerdevanî êrisê dibe ser başûrê Kurdistanê.

Her wiha ev gotina generalên tirk di pîrozbahiyê 1'ê gulanê de jî hate pûçkirin, lewre bi hezaran kesi di pîrozbahiyê de alên PKK'ê wêneyen Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan derxistin. Îsal gele kurd cejna karker û kedkaran li welatê xwe jî pîroz kirin.

Rewşê metropolan û sedemên ci

MAMOSTE AMED

Metropolan di kesayeti helena, merdimatî qedêna, rehmê dârena we bawerî bena qelse, heskerdişî miyan berê merdimatî (ambazî), nasîti, cinarî heme bi feyde wa. Dayış û girotîşê cîna virazêno. Feyde verno heme çî di cayê xwi gêno, êra zêdeyerî zî gava ku feyde çînebo an teşqeleyikî bibo jewbîni ra dûrî kunê.

Sedemê ena şekotîkî û ena qelsî mercî jînê metropolan ê. Ecaba ci rî ma yanê, sedem jînê metropolan û mercîn metropolan, sedem di metropolan di xwiparêzî û xwîxilesnayî, xwiperestî û jewbîni ra dûrî kewtiş, dozey (dagey) xwi ra dûrî kewtiş, verê ciwa qeybogir, ma koçber, ma nefê (surgun) biyê. Ma verê bêranê şaridey û xizmetê neyarî dey ma ina rî xebeitê. Ma inan xwi ra ser binenê, ma tim xwi ra qîj bînenê. Eno zî komplekskew dewletew romî bi siyasetêkew gemar ma sero peyda kerdî û xeme fen û fetulêne nebaşî û metodêne xepenayîş û hilê zûrî û deleverê bi ma kerdî, eyî gavede ma zî musnay a ne başî û a bêkesayeti. Ma kerdî kîndarê jewbîni, ma bi jewbîni kerdê tehli, ma kûnê elanî jewbîni, ma gerez jewbîni kenê. Ma te dir hemberî (xeyîntî) kenê.


Enka zî eynî zulmê xwi dewam kenê, eynî hovîti xwi rey ra benê. Ewo ke ma

Bi heskerdişê welatê xwi, bi heskerdişê dozey (dogey) xwi, bi heskerdişê xelkê xwi, bi heskerdişê ziwanê xwi, bi heskerdişê çand û hunerê xwi, merdim eşkeno ena kay neyarî û enî dek û dolaban ê, enî neyarê zulumkarî pûc veco.

şinawito. Bi ci qaydi merdim esiranê xwi di zerey eywaney zindanî de dewr ro ìna gêno, bi ciwanê hesnînan, bi daran ìna ana bi hovîti kişeno, serey ìna keno werdê, eger wayirê ìna gava yenê serê tirman xortanê xwi cê ra nas nikenê. Des hebî egiti û rîzânê ma şehîd vistî.

Yanê sedem beylû wo: Vengê ma bîbirno, gelê tîna jewbîni ra dûrî ko, welatê xwi ra dûrî ko, aborî xwi ra dûrî ko, çand û hunerê xwi ra dûrî ko, ziwanê (ziman) kurdi xwi vîra bikerô, yanê ma kîlm vaçin bîheliyo, raste ra (meydan) biqediyo.

Bi rastî xelkê kew gava heme çî ra dûrî bîkî, eger zanayışê û zî kemî bo an zî bawerî û qels e bo (zihîfe bo) zewogir neyár wazeno ver bi helnayîş şino. Ew gav gere ma enî plananê enî zaliman pûc vecin. Enî bi heskerdişê welatê xwi, bi heskerdişê dozey (dogey) xwi, bi heskerdişê xelkê xwi, bi heskerdişê ziwanê xwi, bi heskerdişê çand û hunerê xwi, merdim eşkeno ena kay neyarî û enî dek û dolaban ê, enî neyarê zulumkarî pûc veco. Merdim bi zanayış şekew neteweyî, bi jewbîni ka neteweyî, bi kesayeti yey ka duriste û bi bawerî ka xurte merdim eşkeno welatê xwi zî bixelso.



Jî bo çareserkirina pîşgîrêka kurd bi navê TOSAV (Weqfa Lîgerîna Pirsgirêken Çlavak) weqfek hate damezîrandin. Li gorî ragîhanîn weqfî pişî xebateke salekê hatîye avakîrin. Û wê ji bo pirçandî û pir-dengiyê li Tîriyeyê xebatê bide. Di nav piştigirên weqfî de digel kesen biyan, kesen wekî Çetin Altan, Mehmet Altan, Ta-nîk Ziya Ekinci, Ayşe Önal, Etyen Mahçupyan, Haşim Haşimî, İshak Alatan, M. Ali Kılıçbay, Baskin Oran, Müjde Ar, Bülent Tanör, Ali Bayramoğlu, Koray Düzgören û Şeyhîmus Diken hene. Serokê weqfî Doğu Ergil e. Weqfî roja 1'ê gulanê ji bo danasîna xwe panelek li dar xist.



HÊZEN artêşa tîrk bi qasî 10 km'ya ketin nav sînorêne başûrê Kurdistanê. Tê ragîhandin kû, hêzên artêşa tîrk, bi 40 hezâr leşkerî û cerdevanen ketîne başûrê Kurdistanê. Di vê navberê de 4 cerdevan û leşkerek hafine kuştin. Li gorî nûcaya rojnameya Radikalê, cerdevanen birîndar didin xuyakîrin ku PKK'yî gelek in û li dijî çalakiyên leşkerîn tîrk il ber xwe didin. Li alyê din ji fermandarê ARGK'ê Ebubekir, da zanîn ku wan amadehiya xwe li dijî hêzên tîrk kiriye û ewê derbeyen mezin li hêzên tîrk bixin. Ebubekir hêzên başûrî xwest ku piştigirîya dagirkiran nekin û ji parastina rûmeta xwe ya neteweyî li dijî wan şer bikin. Her wiha ji gelê başûrê welêt ji hate xwestin ku ew xwe li dijî dagirkirîne birxistin bikin.

NÛÇE

Kurd bi sembolên xwe daketin qada 1'ê gulanê

Li alyê din gelê kurd bi awayekî girseyî beşdarî cejnê bû. Di korteja tevgera kurd de digel simbol û nîşanên HADEP'ê, al û pankart, posterên PKK, ERNK û ARGK'ê jî hebûn. Cemawera kurd sloganên wekî "lêxe gerîla lêxe, Kurdistanê ava bike", "Bijî Serok APO", Bijî ARGK, ERNK", "Bijî biratiya gelan", "Dewleta kujer, ji Kurdistanê derkeve!" avêtin.

Cejna Yekîti, têkoşîn û piştigirîye ya karker û kedkarêن cîhanê 1'ê gulanê bi beşdariya bi deh hezaran karker, kedkar û hêzên pêşverû li Abideyi Hürriyeta Stenbolê hante pîrozkarin. Di gel sendikayênen wekî Türk-İş, Hak-İş, DİSK û KESK'ê geleb partiyênen wekî HADEP, ÖDP, DBP, SIP, İP, EMEP, CHP û rîexistinên şoreger ên wekî PKK, DHKP-C, TKP-ML, MLKP, TİKB û hwd. di pîrozbahiyê de cih girtin. Divê bê gotin ku piraniya girseya gel nikaribûn bikevin qada mîtingê, li ser vê yekê hinek ji wan belav bûn, hinek jî bi girseyî berê xwe dan cihekî din.


Li ser vê mijarê Sekreterê HADEP'a Stenbolê Cemal Çoşgun da zanîn ku wan bi xwe girse belav kirine, lewre bi helwesta polisan a pêsiya gel birîn, jix-we girseyê HADEP'ê nedikarî bikevin qada mîtingê. Li gorî agahîyan li hinek taxên wekî Okmeydanî di navbera gir-

se û polisan de şer derketiye û gelek kes hatine binçavkirin û çend jî birîndar bûn e.

Berî ku girse bikeve qada mîtingê rîexistinên şoreşger helwesteke tûj li dijî partiyê rejîmê yên ku bi ala tîrkan û posterên Atatürk hatibûn cejnê nîşan dan. Her wiha gelek kesî korteja CHP, BP û İP'ê pişî qadê jî bi fikan û dengê yuh protesto kîrin.

Li alyê din gelê kurd bi awayekî girseyî beşdarî cejnê bûn. Di korteja tevgera kurd de digel simbol û nîşanên HADEP'ê, al û pankart, posterên PKK, ERNK û ARGK'ê jî hebûn. Cemawera kurd sloganên wekî "lêxe gerîla, lêxe Kurdistanê ava bike", "Bijî Serok APO", Bijî ARGK, ERNK", "Bijî biratiya gelan", "Dewleta kujer, ji Kurdistanê derkevel" avêtin.

Her wiha li qada mîtingê hunermendê wekî Ferhat Tunç, Metin Kahraman, Nilüfer Akbal, bi stranên xwe beşdarî



pîrozbahiyê bûn. Tiştekî balkêş jî protestoya girseya gel a li dijî serokên sendikayênen wekî TÜRK-İŞ û DİSK'ê bû.

Li Amedê 1'ê gulanê

Li alyê din gelê kurd ji demeke direj ve ye ku li welatê xwe cejna karkestan pîroz dike. Karker û kedkarênen kurd, digel welatparêzan û di bin rîberiya HADEP'ê de cejna xwe li Amedê pîroz kir. Li gorî agahîyan ku bi dest me ke-

tine, tevî ku rayedarên dewletê destûr nedane pîrozkarîne jî, bi deh hezaran mirov saet di 12'yan de li Meydana Dağkapı civiyane û bi sloganên "Bijî yek gulan", "Bijî aştî", "Li dijî faşîzmê mil bidin hev" cejna xwe pîroz kirine. Di pîrozbahiyê de Serokê HADEP'a Amedê Abdullah Akin axaftinek kir. Akin xwest ku dawî li şerê qirêji bê û effuyeke gişî were flankirin.

NAVENDA NÛÇEYAN



Tewandinâ navan û çewt bikaranîna tewandinê di nûçeyên MED-TV'ye de

BARAN RIZGAR

Mirov di tekstê kurdî de pîrîcar li çewt tewandinâ navan rast tê. Her wiha di nûçeyên MED-TV'ye de jî çewt tewandineke domdar heye. Ez dibêjim 'domdar' ji ber ku di hemû nûçeyên ku min guhdañî kirine de ez lê rast hatime. Ev tewrê bikaranîna tewandinê her çiqas li gorî tewandinâ devokekê be jî, ne li gorî qaydeyên rîzimana kurdi ye û her wiha hem dibe sedemâ tevliheviyên rîzimanî û hem jî mesajên tewandinê tevlihev dike. Her çiqas di vê nivisê de ez MED-TV'ye ji bo tewandinâ navan di bernameya 'nûç' de rexne dikim jî, divê ez bibêjim ku di tevahiya bernamayen MED-TV'ye de bihîstyariya (hasasiyet) ji bo zimanê kurdi bi zelalî xuya dibe û ev rastî MED-TV û ber dilê mirov şerîntir dike. Ji lew re ez dixwazîm bi vê rexneyê re pirozbâhî û sipasdiraya xwe jî ji bo hemû xebatkarén wê binum zimên.

Ev nivis ê hewl bide ku du karan bi hev te bike; ew ê ji aliyekev ve bi gelemperî tewandinâ navan şrove bike û ji aliyekev din ve bikaranînen ne li gorî qaydeyan û tevliheviyên ku dîbin sedem diyar bike.

Tewandin

Cârîna ji bo fonksiyonêkê paşpirtik girtin û tewandin têvîhev kîfîn. Wek, gava ku em dibêjin pirtûkek, em pirtûkê natewînin. Em paşpirtika raweya nebinavkirî bi kar tînin ku em diyar bikin ku em qala pirtûkeke binavkirî (taybetî) nakan.

Tewandin di hin rewşan de guherina nav an cînavkan e. Di van rewşan de nav paşpirtikekê digirin, wekî 'Ez ê pirtûkê bidim te'. Pirtûk hatîye tewandin û /-ê/-girtiye. Ev paşpirtik li gorî zayend (nîr an mî bûn) an pirejimartiya nav dikane /-ê/, /-î/ yan /-an/ be, /ê/ ji bo navê mî yêne yekejimar, /î/ ji bo navê nîr ên yekejimar. Û /an/ ji bo hemû navê pirejimar: Ew kovarê dixwîne. Ew kevireki davêje. Ew kovaran keviran davêje.

Hin cînavk di rewşa tewandî de bi peyveke din cih diguherînin, hin cînavk ji paspirtikeke tewandinê digirin û dikannî bi wê paşpirtikê re kurt bibin û forma xwe biguherînin. Ji ber vê yekê di kurdi de du komêni cînavkan hene. Cînavk xwerû (netewandi): ez, tu ew, em, hûn, ew û cînavk tewandî: min, te, wî/wê (1), me, we, wan (2).

Di rewşen ku nav xwerû (netewandi) têbikaranîn de cînavk xwerû têbikaranîn: Mamoste çû/ew çû. Mamoste çû/ew çû.

Di rewşen ku nav ditewe de cînavk tewandî têbikaranîn: Mamosteyan xwar/wan xwar. Keçikê ew dît/wê ew

dît. Serok(i) jê re got/wî jê re got.

Li jor me got ku tewandin di hin rewşan de guherîna nav an cînavkan e. Mirov ji vê tê digihêje ku nav û cînavk di her rewşê de nayê tewandin, aango di hin rewşan de têbikaranîn û di hin rewşan de jî nayê tewandin, xwerû têbikaranîn. Yek ji qaydeyên bingehîn ên rîzimana kurdi (kurmancî) ev e. Her kesê ku li ser rîzimana kurmancî rawestiyaye ji vê haydar e. Li vir bersiva vê pîrsê dîmine; di kîjan rewşan de nav û cînavk têbikaranîn û di kîjan rewşan de nayê tewandin?

Beri ku bersiva vê pîrsê bê dan, gîring e ku qaydeyeke gelempêri ya rîzimana kurmancî li vir bê ziman: Di hevokêkê de kirde (subje) û biresera (obje) sérast (direkt) bi hev re nayê tewandin, gava

ranînê bikin.

Rewşen ku nav û cînavk xwerû (netewandi) têbikaranîn.

a) Wek kirdeya hemû lêkerên negerandî di hemû deman de:

Ew çûbû. Ez çûm. Azad hat. Karkek reviya. Mamoste meşyan. Keçik dicin ku? Zarok ê li ku rakevin?

Mînakê çewt bikaranînê:

"Gerflayekî hat kuştin." (3) Ev tewandin çewt e. Ji ber ku raweya tebatî (pasîv) li gorî lêkera 'hatin' çedîbe û 'hatin' lêkereke negerandî ye û kirdeya wê her tim xwerû ye, nayê tewandin. Wekî Ez hatim. Karkerek hat. Gerflayek hat. Gerfla hatin. Diviya bigotina: Gerflayek hat kuştin.

"Van kesan gerflayekî bi lêdanê kuştine." (3) Ev tewandin bi du aliyan çewt e.



ku kirde tewandî be, bireser xwerû (netewandi) ye û gava ku bireser tewandî be, kirde tewandî ye. (Wî ez ditim/Ew min dibine/Ez pîrsêkê dixwînim/Min pîrsêk xwend/Min pîrsêk xwendin/Ez pîrsêk dixwînim.)

Divê du tewrê lêkeran (fiilan) ji bên şîrovekirin: Lêkeren gerandî (transitive, geçişli) û lêkeren negerandî (intransitive, geçişsiz).

Lêkeren gerandî bi bireser serast re têbikaranîn. Wek: avêtin, dîtin, xistin, kîrin, gotin, hwd. Tevgera lêkeren bi vî rengî li ser bireseran e. Wek: Min kevirek (bireser) avêt, wî mamoste (bireser) dît, Zelalê şibakeyek (bireser) şikand.

Lêkeren negerandî bi bireseran (obje) re nayê tewandin. Wek: çûn, hatin, mîşin, revîn, bûn, ketin, peyivîn, hwd. Ev tewre lêker bi bireseran serast re nayê tewandin. Wek: Ew zû çû, hûn bixêr hatin, emê li ku bimeşin, mîvan li ku radikevin, kî ji daşê ket, hwd.

Piştî van şîroveyan em dikanin dest bi rewşen tewandinê û mînakê çewt bika-

Yek jê wek ku li jor hat gotin, di hevokêkê de hem kirde, hem jî biresera serast nayê tewandin. Wan her du jî tewandine: Van kesan, gerflayekî.

Rastiya wê: Van kesan gerflayek bi lêdanê kuştine.

"Jînek mir, heft jin jî birîndar bû." (4) Dîsa 'mirin' negerandî ye. Rastiya wê: Jînek mir, heft jin jî birîndar bû.

"Eşkerekî hate kuştin." (5) Dîsa raweya tebatî, kirde nayê tewandin. Rastiya wê: Eşkerek hat (e) kuştin.

"Girtiyekî hate kuştin." (5) Dîsa raweya tebatî, kirde nayê tewandin. Rastiya wê: Girtiyek hat(e) kuştin.

"Qereqolekî hate hilwesandin." (5) Dîsa raweya tebatî, kirde nayê tewandin.

Rastiya wê: Qereqolek hat(e) hilwesandin.

"Li navenda bajêr şerekî derket." (6) derketin negerandî ye, kirde nayê tewandin.

Rastiya wê: Li navenda bajêr şerekî derket.

b): Wek biresera lêkeren gerandî di

demêni borî de:

Wî ez ditim. Me karkerek dit. Wan kevir avêtin. Eyşanê pirtûkek da min, karkeran belavokin dixwendin, hwd. Li vir paşpirtik /-in/ û /-ek/ diyar dîkin ku ew nav nebinavkirî ne, ew ne ji bo tewandinê ne.

Mirov ji van her du xalan tê digihêje ku nav û cînavk di her du rewşen jorîn de xwerû têbikaranîn, nayê tewandin. Wê gavê pirejimartî ji ji lêkerê diyar dîbe.

Mînakê çewt bikaranînê

"T.O. bi rojnameya 'Evrensel' re hevpeyvînek çekir." (7) Wekî ku li jor hat gotin, bireser lêkeren gerandî di demêni borî de netewandi ne. Rastiya wê: T.O. bi rojnameya 'Evrensel' re hevpeyvînek çekir.

"Hêzên PDK'ê 4 kesan kuştibûn." (8) Li gorî qaydeyê: Hêzên PDK'ê 4 kesan kuştibûn. "Dewleta tirk daxwuyaniyek belav kir." Li gorî qaydeyê: Dewleta tirk daxwuyaniyek belav kir.

"J.S. axaftinekî kir." (9) Li gorî qaydeyê J.S. axaftinek kir.

"PDK 4 penaberan kuştibûn." (10) Li gorî qaydeyê: PDK 4 penaber kuştibûn. "Mî hikûmetê anî xwar." (11) Li gorî qaydeyê: Mî hikûmet anî xwar.

"Gerflayan sabotajî li dar xistîne." (12) Li gorî qaydeyê: Gerflayan sabotaj li dar xistîne. Li vir kişandina lêkeren (xistîne) pirejimartîya 'sabotaj'ê dîde.

"Hecî Miro vê daxwuyaniyek da MED-TEV'ye." (12) Li gorî qaydeyê: Hecî Miro ev daxwuyanî da MED-TV'ye.

"Wan vê hevdîtinê amade kirine." (12) Li gorî qaydeyê: Wan ev hevdîtin amade kiriye.

"Partiya wan aşîtiyê parast." (14) Li gorî qaydeyê: Partiya wan aşîti parast.

Rewşen ku nav û cînavk tewandin têbikaranîn

a) Wek kirdeya lêkeren gerandî di demêni borî de:

Wî lawik nedît. Min kevirek avêt. Wan tiştek negot. Xwendekaran dan we. Keçikê çirokek got? Karkerekî ew şikand.

b) Wek biresera lêkeren di Dema Niha, Dema Pêsi, Bilanî de:

Ez wê/ wî/wan/ kurekî/ keçekî/ kuran/ keçan dibînim. Zarok ê kevir(i)/ kevireki /keviran/ /kevirinan/ /gogê/ /gogekê /gogan/ /goginan/ bavêje.

c) Wek biresera daçekan:

Li malê/ malekê/ malan/ malinan, di xanî(yî) xaniyekî/ xaniyan de. Li vir di vê mirov bala xwe bidê ku navê mî yêne yekejimar /-ê/, yêne nîr ên yekejimar /-a/ û yênen pirejimar ji /-an/ digirin.

Mînakên çewt bikaranînê

"Hevdîtinê ji bo çareseriye kî.⁽³⁾" Wekî ku li jor hat gotin, navê mî /e/ digirin. Hemû navê ku bi lêzêdekirina paşpirtika /-î/ hatine çêkirin (başî, xerabî, zelalî, hwd.) mî ne. Rastiya wê: Hevdîtinê ji bo çareseriye kî.

"Gerîlîyan êrîş kirin ser qereqolekî.⁽⁸⁾" Qereqol navekî mî ye. Rastiya wê: Gerîlîyan êrîş kirin ser qereqolekê an jî Getîlîyan êrîş qereqolekê kir.

"Ji vî hikûmetê.⁽⁶⁾" Vî ji bo navê nîr tê bikaranîn, hikûmet navekî mî ye.

Rastiya wê: Ji vî hikûmetê.

d) Di 'raweya xwedîti' de (possessive, malikiyet):

pirtûka min /te /wî/ wê/ me/ we/ wan/ xwendekarekê/ xwendekarekî/ xwendekaran. Hemû nav an cînavkên ku xwedî diyar dikin tewandî ne û li gorî nîr an mîti an jî pirejimartiya xwe ji /-ê/, /-î/, /-an/ yekê distînîn. Li vir divê mirov bala xwe baş bide paşpirtikên ku peyvika pêşîn bi ya dawîn ve girê didin jî:

Pirtûka min (/a/ ji ber ku nav mî û binavkîrî ye)

Pirtûkeke min (/e/ ji ber ku nav mî û nebînavkîrî ye, di zimanê axaftinê de /e/ pirîcar dikeve: pirtûkek min)

Pirtûkine min (-e ji ber ku nav pirejimar û nebînavkîrî ye, di zimanê axaftinê de /-ine/ pirîcar wek /-ne/, /-ni/ an /-nî/ kurt dibe: pirtûkne/ ni/ nî min).

Pirtûkên min (/ê/ ji ber ku nav nîr û binavkîrî ye)

kurê wan (/ê/ ji ber ku nav nîr û binavkîrî ye)

Kurekî wan (/î/ ji ber ku nav nîr û nebînavkîrî ye).

Di pirejimartiyê de paşpirtikên ku navê nîr û mî digirin yek in:

(keçen/ kurên wan).

Mînakên çewt bikaranînê

"Bernameyekî taybetî me amade kir.⁽³⁾" Wekî ku li jor hat gotin, navê mî /-e/ digirin. Navê 'bername' mî ye (hemû navê ji name tên çêkirin mî ne, ji ber ku name bi xwe mî ye), ji lew re em dibejin bernameya taybetî. Heke em bibejin bernameyekî taybetî, wê gavê divê em di rewşa binavkîrî de bibejin bernameyekî taybetî. Rastiya wê: bernameyeke taybetî.

"Kampanyakî qirêj dest pê kir.⁽³⁾" Rastiya wê: kampanyeke qirêj.

"Heyetekî ku ji herdu aliyan pê tê." Rastiya wê: Heyeteke ku....

"Jinekî İndian birîn bû.⁽³⁾" Rastiya wê: jineke İndian.

"Gerîlîyan êrîş birin ser hêzekî PDK'ê.⁽⁴⁾" Rastiya wê: hêzeke PDK'ê.

"Tiştek balkêş bû.⁽⁹⁾" Li vir paşpirtika pev girêdanê tune. Rastiya wê: tiştekî balkêş bû.

"Erebeyekî leşkerî ket kemîna gerîlîyan.⁽⁵⁾" Rastiya wê: erebeyeyeke leşkerî...

"Hikûmetekî hindikahî...⁽⁵⁾" Rastiya wê: hikûmeteke hindikahî

"Fersendekî dîrokî...⁽¹²⁾" rastiya wê: fersendeke dîrokî.

"Panzerekî malê alman...⁽¹²⁾" Rastiya wê: panzereke malê alman.

"Ji bo civînekî di qada bilind de...⁽¹³⁾" Rastiya wê: civîneke di qada bilind de.

"Li ber dewleteke filistînî...⁽¹³⁾" Rastiya wê: Li ber dewleteke filistînî.

"Bombeylekî ku neteqiyabû...⁽¹³⁾" rastiya wê: Bombeyleke ku neteqiyabû.

"Demekî dîrek...⁽⁶⁾" Rastiya wê: demekî dîrek.

"Firekî me ew e.⁽¹⁴⁾" Rastiya wê: Fireke me ew e.

(1) wî kurteya ewî, wê kurteya ewê û

wan kurteya ewan e.

(2) Wek ku tê zanîn paşpirtika /-î/ ya ji bo navê nîr ên yekejmar gava ku nav binavkîrî be bi piranî tê xistin. Lî belê di rewşa nebînavkîrî de her tim tê bikaranîn: Serokekî jê re got. Her wiha hek serok mî bûya, me yê bigota.

Serokekî serokê jê re got,

(3) Med-TV, Nûçe, 12.09.1995.

(4) Med-TV, Nûçe, 14.09.1995.

(5) Med-TV, Nûçe, 21.09.1995.

(6) Med-TV, Nûçe, 07.10.1995.

(7) Med-TV, Nûçe, 14.09.1995.

(8) Med-TV, Nûçe, 15.09.1995.

(9) Med-TV, Nûçe, 20.09.1995.

(10) Med-TV, Nûçe, 23.09.1995.

(11) Med-TV, Nûçe, 21.09.1995.

(12) Med-TV, Nûçe, 03.10.1995.

(13) Med-TV, Nûçe, 06.10.1995.

(14) Med-TV, Nûçe, 10.10.1995.

Gotina dawî

Ev nîvîs di 11. 09. 1995'an dê li ser erêkirina weşandinê ya bi telefonê ji rêbeberên rojnameya Welat re hat şandin. Lî belê heta iro nehat weşandin. Sedenmî newesandinê jî nehatin gotin. Li vir ez dixwazîm başa wan hevalan bikişînim ku mafê nivîskar heye ku ji newesandina nîvîsa xwe bê agahdarkirin. Dibe ku weşandina nîvîsa xwe girîng bibîne û hewl bike ku bi riyeke din wê biweşîne.

Piştî daxwaza weşandinê di avrîla 1997'an de min li gorî qaydeyên jorin dîsa li nûçeyen MED-TV'ye guhdarî kir û dît ku nav û cînavkan hîn jî bi awayê li jor gotî ditewinîn. Hin mînakên nû li jér in. Ez hêvi dikim ku hevalen rîveber li ser vê nîvîsê rawestin û helwestekê diyar bikin.

"Ocalan vê pirsê kir.⁽¹⁵⁾" Rastiya wê: Ocalan ev pirs kir.

"Ocalan balê kişand ser...⁽¹⁵⁾" Rastiya wê: Ocalan bal kişand ser.

"Gundiyan heyetan vexwendin gund.⁽¹⁶⁾" Rastiya wê: heyet vexwendin gund.

"Tîrkiye gelek sozan daye.⁽¹⁶⁾" Rastiya wê: Tîrkiye gelek soz dane.

"M.A. Altun daxuyaniyekî belav kir.⁽¹⁷⁾" Rastiya wê: M. A. Altun daxuya-niyek belav kir.

"Cahşen ku di çeperen xwe de nobetê digirtin.⁽¹⁷⁾" Rastiya wê: Cahşen ku di çep-reñ xwe nobet digirtin.

"Bi awayek azad.⁽¹⁷⁾" Rastiya wê: Bi awayek azad.

"Heger Tîrkiye herêm dagir bike.⁽¹⁸⁾" Rastiya wê: Heger Tîrkiye herêmê dagir bike.

"Gerîlîyan bi roketek li helikopterek daye.⁽¹⁹⁾" Rastiya wê: Gerîlîyan bi roke-tek li helikopterekê daye.

"Cahşek bi navê Ramazan Eryilmaz.⁽¹⁹⁾" Rastiya wê: Cahşekî bi navê Ramazan Eryılmaz.

"Gundiyan ev bangê kirin.⁽¹⁹⁾" Rastiya wê: Gundîyan ev bang kir.

"Iraq vê qedexyê nas nekir.⁽²⁰⁾" Rastiya wê: Iraqî ev qedexe nas nekir.

(15) Med-TV, Nûçe, 14.04. 1997.

(16) Med-TV, Nûçe, 15.04. 1997.

(17) Med-TV, Nûçe, 16.04. 1997.

(18) Med-TV, Nûçe, 17.04. 1997.

(19) Med-TV, Nûçe, 19.04. 1997.

(20) Med-TV, Nûçe, 22.04. 1997.

Cavkanî:

Kürçê Grameri, Emir Celadet Bedirxan û Roger Lescot, Doz.

Dersén kurdî, Baran Rizgar, 1993, London.

A Basic Course in Modern Kurmançî, P. Hikkert, alew Books, 1991, Belçika.

Lê kurde Sans Peine, Kamuran Bedir Khan, 1989, Institut kurde de Paris.

Aydino lo aydino, mala mino aydino!

FAYSAL DAĞLI



I skandînavya sar e. Mirovên îskandînavya cemidî ne. Qeşa ne tenê li avê û li kevirân dixe li van deveran. Mirovên vî welatî jî qeşa digirin. Serma ku di ruhê mirov de qulekê bibîne, hêdî hêdî laşê mirov dagir dike û seranser dîl digre.

Ev ji bo biyaniyê vê deverê jî wisan e. Ger ku agirê dîlê mirov bitefe, êdî li hemberî qeşayê bê parastine.

Li xerîbiyê tişte herî girantir hesreta welat e. Kurdên îskandînavya jî bi vê hesretê ne. Çavên hezaran mirov bi dilekî xemgîn li benda riya welat e. Pirên wan bi salan e. bêhna welat nekirine. Lê hinek serekên me yên kevn û rewşenbîrên me ji bo ku kesera dilê xwe sivik bikin, riyan-gelek sosret dîtine. Ew ji bo ku herin (nêzî) welat, li dijmin dekên ecêbmâyî dijin; Pêşiyê seri li Konsoloş Komara Turkiyeyê dijin û dibêjîn: "Em dixwazîn herin nobedariya welat." (Ew ne welatê me, ê tirkan) Hinek ji wan gelek jî

pere bi ser de dide artêşa dagirker û paşê biletikê balafirê dişînin û bêbelâ, bêqeza digîjin garnîzona xwe.

Bi deka leşkeriyê, li deverên nêzî welat têr digerin, mirovên wan tên seredariê. Ew bêhna xwe derdixin. Heta dijmin jî xewwa xefletê hişyar dîbe, rewşenbîrên me, li diwarê balafirxaneyê baz didin û careke din berê xwe didin Swêdê.

Kero dijmino, tu bi kê re direqisi, haya te ji te heye? Em li serê xelkê wisa dikan!

Ew çalakiyê romantîk her çiqas bitalûkebe jî, di nav beşek kurdêr Swêdê de gelek tê bikaranîn. Heta yê ku jî bo welat dijin bi navê leşkeriyê dijmin dixapînîn, gelekan jî vî dijminî işkence û eziyeten mezin jî dîtine, heta hinekên wan; gelek mirov, birazî û xal û xwarziyê xwe şehîd dîne. Hinek ji wan jî bo ku dilê kurdê din pê neşe, bi dizî diçin welat. Fedî dijin, lewra derûdora wan ne xwedî derfet in ku ew jî vê dekê li dijmin bikin û di bin navê leşkeriyê de herin kesera dilê xwe bitefinîn.

Swêdiyê ku li rewşenbîrên me dinêrin û ji ber romantîzma van çalakiyê welatperwerane wisa dibêjîn: "Xwezi weletê me jî di bin dagirê da bûya û em jî li xerîbiyê penahende bûna. Meyê jî li dijminê xwe wisa bikira û bi deka leşkeriyê biçûna, welatê xwe bidîta!"

Lê em zanîn ku ew derewa dikin. Dema ku welatê wan di bin dagira naziyan de bû, û pirê wan reviyabûn derive, yekî ji wan tiştekî wisa neanî bîra xwe ku bikin.

Rewşenbîrên me di konferans û di semîneran de, ku li ser navê kurdîyetiye tên dawetkirin, bi helbestan bersiv didin swêdiyê heyranîn xwe û li ser vê mijarê dibêjîn:

Wek şâîr dibêje; Ci kir, me ji bo welat ci kir, hinek mirin jî me, hinekan jî nûtq avêtîn! (Rewşenbîrên me ev gotin niha wisa guhertine: Ci kir ji bo welat me çikir? Hinek mirin jî me, hinekan jî ji dijmin re leşkerî kir.)

Ev çalakiyê rewşenbîr û serekên kevn, wê wekî mînakên qehrîmanîyê derbasî rûpelên dîrokê bibin. Her çiqas neteweyen din û alema mirovahiyê mînakên wisa nedîtibin jî, bila ev jî xelata me be jî wan re.

Bi ew qas dilpaki û pakrewaniya xwe, dîsa jî ev rewşenbîrên me ji alyê hinekan ve nayen fêhmîrin. Mînak kurdekkî pîr li Swêdê ku qeşa negirtiye û pirtûk nexwendîne û nenivîsandine û heta niha nebûye serkekekî tu tişî û bi ser de jî lawê xwe di riya çiya de şandiye leşkeriyê, wisa digot: "Aydino lo aydino, mala mino aydino!"

Keyna Seyîd Riza

Şehîd Yadigar Doğan

Jûnakî, Yadigar sosyalîst bî. Sosyalîzmî sero weş vinderd bî.
Wexto ke, ay jû xebat (ca) kar diye fikranê xo rew şayê
(bîmûsno) bîmosnayê ïnan. Cok ra, embazê ay miyan de,
karkerî veşî est bî. Ay bi xo jî karkerî kerdibî û ïnan miyan de
bol (vêşî) mendibî.

Azey tayn keçanê kurdî teber dê welatî de gird bîbî. Dersim de amêbî dinya. A hewna qeçek biya ke malbata ay ameya Bursa. Cok ra, a na sûka xerîban de gird bîbî. Embaz Yadigar sıftein (verî) çepê tirkân ra bî. Ma piya wanavanayê Unîversîta (Zanekey) Marmara bî. La belê ay Fakulta Edebî de wanayê, Ay ra, (co ka) ma pê silasna û biyê embazê pê. Embaz Heydoyî a mûsna bî ma.

Kiştâ xebatî (xeftiyayin) ra, ma jew jî qedê Yadigar nebiyê. Unîversîti de, teberî de xebatê cinîye kurdî de, şaro ke Kurdîstan ra abiryay û amebî Stanbolî; ma miyandi şew û roj gerweyayışoki xurt dayê. Wexto dema yê ne ameyê Unîversîti ma cirê vatê: "Embaz tiya kotî de menda"? Ay marê vatê: "Miletê xo miyand biya. Şima fine bizanê ke ez ïna miyan de senî weş bena. Ez nêzana ke ne kampûsi miyan de çiçî ke esto. Botan ra, Serhat ra, Amed ra, Koçgirî ra newe newe şaranê xo silasnanena. Wa embazî heme (pêro) şirê şare ma miyand ke Kurdistani nezdî ra bivîne".

Jûnakî, Yadigar sosyalîst bî. Sosyalîzmî sero weş vinderd bî. Wexto ke, ay jû xebat (ca) kar diye fikranê xo rew şayê (bîmûsno) bîmosnayê ïnan. Cok ra, embazê ay miyan de, karkerî veşî est bî. Ay bi xo jî karkerî kerdibî û ïnan miyan de bol (vêşî) mendibî.

Sera ñeway û jewî de, jûwa gulanî de wendevane welatperzî (wendoxanê welatperweran) jî waştê ki karkerana biviyê Taksîm. A roj mä çahar embaz wanavanî piya şîbî ewja (wija). È embaza ra jew jî Yadigar Doğan bî. Ma didi, didi, pê pey ra Şîşlide (Şîşli) ra hetê Taksîmî ya kewtîm ray) vera Taksîmî bi lingana kewtî ray, Yadigar û jew embazo Dersimij jî ma vernî de, ez û embaz perwîn ïna pey de şiyê.

Taksîm bîbi cado ze tiyatroye


polîsan. Polîsan ra ca çinêbi ke, derzîn bikewo erd. Çiçik yeno aqildirê şima a est bî, o ca de. Ma wewna ke, mayê nêşê (nêşenê) dekewê Taksîmî. Sifte ma rawerdî vera Şîşxane. Polîsan Şîşxane de, merdim aredayê, ma fina ageyrayê vera Taksîmî. Hewna ma nêresabî Tarlabâşî, polîsa ma tepiştî û berdî Qereqolê Beyoğlî. No fin qeréqolî de, ca nemendibi.

A roj nezdiya hîre çahar hîzar merdimî, kewtbî çimabind. Ay ra komîserê qereqolî, di polîsarê vat: "Nîna berê ca do polîsê taybetiyê Bayrampaşa". Hurd na polîsan kaxîte sereyê ma girotî û ma rê, vat: "Ma şirê Bayrampaşa". Ma qereqol ra, viyyay teber, teberdê Qereqolî de, ma wewna ke Yadîgara polîsarê vana: "Şima ma berê Bayrampaşa çiçî dekewa dest re şima, ma veradê, ma şirê kê xo". ïnan ra jewî vat: "Nêbeno, mayê şima berê". Ma wewna nê polîsî bol merdim aredayê û berdê, ay ra jî eciziyayê. Yadîgari ma rê vat: "Şima jî tayna vajê, ê ma veradê. Jû ma ra jû ïna ra, kaxîte serî dayê ma û ma veradayê. Ma, ê polîsan hetek nişti otobosê beledî. Otobas vera Aksaray amê.

Otobosî miyan de, mi vat: "Embaz Yadigar qeratê ma no bî? Eger karkerî paykewê mayê tewrdê ïnan bê. La belê ïna qe nêbi, mayê jî ageyrê unîversîti. Embazê bînan jî biye tayê mi. Na qerara maya newî sero embaz Yadîgar vat: "Raşto, qerar wini yo, la belê eza fina jî şira Taksîm, şima senî wazenê winî bikerê".

Embaz Yadîgar Unkapanî de, ma jî Aksaray de, amey cêr otobos ra. A roj ma hîre embazî piya şiyê unîversîti. Yadîgar, a roj neame (niyamê). Bi meşt fina neame(niyamê). Wexto ke, a neame ma fahm kerd ke, kewta çîma bind.

Bîro ma wewna ki embaz Yadîgar amê, çinayê ci biyo leymin, (qilîrin) porê ci kewto pê



miyan. A haldê xo de jî, embaz hiwayeyê(wiyayê). Embazan ci re vat: "To se kerd, ti ya kotîd mend a"? Zek çiye nêbiyo ay vat: "Çi re, se biyo, şima bizanê ke, no çend finiyô eza kewta çîma bind. Ne welatî de merdimî ke şoreşker bo heme çî yeno ci sere. Qey ke ezî vana şoreşkera, ay senî wina vat ma tayn xo ra şerm bî. No fin ma rê vat: "Raşti mi goş nedî embaza xeta mina".


Embaz Yadîgar zaf xurt û zaf delal bî, ay qet embazê xo nêşikitê, la belê kemasiya (kemîyîna) ci nabî, însanan ra rew bawer biyê.

Arê (mabenê)Yadîgari û embaz Perwîni zaf weş bi, Perwîni ay rê

vat: "Embaz na leymina to çiçî yo?" Yadîgari no fin vat: "Merdim yaxerî (varenî) bind de, di şewî bîmano winayin beno embaz".

Yadîgar çîma bind senî viyyena verî yena Unîversîti ke, ma nekewê kaxûdê ci. A roj Perwîna piya şîye keye. Di serî tepya Embaz Yadîgar, Emîne Akkuzu û Nasir Zorlu sûka Elazîzî de, jû keyî miya sax (weş) kewnê destanê polîsanê tirk. Polîs hîrin jî o ca de (wija) danê gulan vero. ïna şehîd şoreşa ma kurdan ê. Ze Seyîd Rizo.

ZÜLKÜF KİŞANAK



● 7.05.1639:

Peymana Qesra Şîrîn çêbû. Li gorî vê peymanê Kurdistan bû du parce, parek ket bin destê osmaniyan, para din jî ket bin destê farisan.

● 5.05.1987:

Komara Tirkiyeyê pişti Serhildanâ Çiyayê Agirî bi navê "Mecbûbî Iskan" qanûnek'ji bo kurdan derxist. Armanca vê qanûnê ji hev belavkirina eşîrên kurdan bû. Her wiha bi çêkirina vê qanûnê, dewleta tirk dixwest ku rê li ber serhildanen kurdan bigire, kurdan ji herêmê derxe û tirkmenan li herêmê bi cih bike.

● 6.05.1972:

Jî reberên THKO'yê Deniz Gezmiş, Hüseyin Inan û Yusuf Aslan hatin daleqandin. Ew di rojê 18 û 24'ê adara 1971'ê de li Sêwazê hatin girtin. Salekê di Girtîgeha Mamak Ya Enqereyê de man û şeva 6'ê gulana 1972'yan li Enqereyê ji aliyê komara Tirkiyeyê ve hatin darvekirin.

● 7.05.1993: Partiya Demokrasiyê (DEP) hate damezirandin.

● 4.05.1995: Dayik û malbatê kesen di bin çavan de hatine windakirin, ji bo ku zarokên wan bêñ dîtin li ber Lîseya Galatasarayê dest bi rûniştinê kîrin.

AWIR

Proleterekî nezan û rewşenbîrekî tirsonek



Lîstika bi navê Sığıntılar (Penahende), jiyana karkerekî û şo reşgerekî ya li derveyî welatê wan tîne pêşberî mirov.

Proleter, bi armanca ku pera qezenc bike, malbata xwe li welêt hiştîye û çûye weleteki biyan her wiha, li wir li yekî rast hatiye ku ew jî ji ber sedemêni siyasi ji bo ku xwe xelas bîke ji welat reviyaye.

Li bajarê biyan, li xaniyekî di qatê binerd (serdep) de bi kirê rûdinin, her wiha karker li dijî xebata xwe tim di xaniyê binerd dê ye û rewşenbîr ji tîrsa polis û dewletê nikare derkeve derveyî wî xaniyê ku ji bêhna lexeman, ji dengê avê û zimezim û tepe-repa insanên jor, mirov debar nake. Mixabin, hêrsek gemarî di nav dilê wan de ye, hêrsa mal, jin pere û hêrsa xwe xelaskirinê ku ji birçî û tibûna bimirin û kurmî jî bibin ne xema wan e; rihe wan ê neteweyî hepiskirî ye.

Di pêvajoya lîstikê de, şoresserê revok hin bi hin bi ser kesayetiya xwe ve tê û bi hêviya "bi ser xwe ve hatinê" dijî û her tim pirtûkan dixwîne û difikire ku wê çawa haya yê pro-

leter bi zanatiya çîna wî bixe. Karker dixebite, pera digihîne hev û rewşenbîr pirtûkên sosyalîzmê dixwîne.

Di pêvajoya van rojan de hin ramanen erêni di serê karker de çedîbin û ji poşmaniya kirinê xwe yên berê û nezanbûna xwe dike ku xwe dalîqîne, lê difikire, azadbûn û xelasbûnê û welatê xwe difikire û ji vê qerarê vedigere. Belê "hişyarbûna proleter, bilindbûna şoresser e."

Di dawîya vê lîstikê de proleter, ji nezanî, safîti, azweriyê ji bo pereyan dûr dikeve û bi ser kesayetiya xwe ve tê.


Her wiha rewşenbîr, risqê xwe yê talî diceribîne û tirs û revokbûnê ji ser xwe diavêje û dikeve qalibekî nû. Bi hêviya sosyalîzmê, hêviya weletekî azad û jiyaneke wekhev giyanaxwe ya kevn heps dike û ramanen xwe didin ser riya serxwebûn û azadbûna ji bin destê xelkê.

Ev lîstik ji aliyê 4 kesan ku ew xebatêñ xwe bi serê xwe dikin (ne giredayî tu saziyan e) roja 26'ê avrîlê li NÇM'ê hate lîstin û nêzî 90 kesî lê temâse kir.

EVİN RONI

ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



Meş û xwepêşandana Duseldorfê û hin tiştên ku têñ bîra mirov

Roya 26'ê meha nîsanê kurdê li Ewrûpayê di xwepêşandana mezin de carekê din hatin ba hev û careke din bi dengekî bilind qîriyan. Ev xwepêşandanê mîna salêñ buhuri ne li Kölnê, li Bonê yan jî li bajarekî din, belê li Duseldorfê bû.

Navê Dosefordfê ji bo kurdan ne navekî nû ye, ne bi tenê bi vê xwepêşandanê dikeve nav bîr û hafiza kurdan. Mehmeyê ewil li vir li dijî şoresser Partiya karkerên Kurdistanê hatin lidarxistin. Ev der bû merkez û semboleke neheqiya deshatdar û rîveberen alman li dijî gelê kurd û gişk maşen wî yên demokratik, siyasi û kulturi.

Hilbijartina bajarê Dusefordfê ji aliyê organizatör û ınsiyatîfîren meşê ve ne tesadûf, li hevrastîn yan jî qorfelaqiyek bû. Sazkirina meşê li vî bajarî, fikirlekî, bi plan û şewîr bû. Kurdish bi zanebûn ev bajar neqandin. Almanan jî mîna ku bibêjin bi buhurin, me hûn gelekî êşandin de ka li cihê me pîr pê li we kir û em ji zordarê dewleta tirk re bûn alîkar, em gavekê ber bi lihevhatinê biavêjin.

Bi giştî ci li Almanya be û ci jî li ser sînorêñ Almanya û welatên cîranêñ Almanya be meşvanen kurd bî tu astengiyen wekî yên demen derbasbûyi nehatin hemberî hev, bervajî megam û polisên Almanya ci li bajarê Dusefordfê bin û ci jî di wextê hatinê de li ser riya vî bajarî be 'nemtit' û alîkarwaztir bûn, cu cirnexweşî û teşqe derneexistin. Heta serokê belediya bajêr û komserkî rîexistina polis di kamereyen televîzyona MED-TV'ye de axivîn û pesnê rîkûpêkiya Komîteya Meşê û meşvanan dan. Ji ber ku televîzyona MED'ê ji deqîqeya ewil heta bi ya dawî li qada meş û xwepêşandanê bû û giş teferuat, rewş û herka meşê bi wurdî weşand û Rojnameya Özgür Politikayê ji li ser nîvîş ne hewce ye ku em jî di vê meqalê de tiştên hatine gotin û bi iftîmaleke mezin piraniya xwendevanan zanin dubare bikin.

Lê tiştek heye, rastiyek çedîbe ku edî çu kes û cu hêz hew kare û ne xwedî maf e ku kurdan bisekinîne. Dereceya xwenaskirin û organîzebûyîna kurdan, awa û xurtiya hevdugirtina kurdan, xwedîderketina wan li xwe, nîrx û hêjayîyên neteweyî, israr û eşqa wan ji bo azadiyê ku di xwepêşandanê mîna Dusefordfê û forumen din ên cur bi cur de wiha bi komên mezin û li ber çavêñ giş cihanê bi laş û gewde dibin, delîlen diyar in.

Tiştekî din jî diyar û eşkere ye. Ew jî ev e ku kurd dîrokeke nû, netewetiyek û şexsiyeteke nû ava'dikin. Xwe ji nû ve û li ser bingehêke ne wekî ya hetâ niha bi rî dixin. Zemanê kurdan bi rengekî din tê û diçe û bi naverokek bikertir û bi kelktir tijî dibe. Rojekê dîroka iro, meh û sala iro beramberî sed roj, sed meh, sed salêñ berê ne. Zeman bi têr û tijeyî derbas dîbe û muheqeq pey xwe rojekê bi xizmet ku me hinekî din dike yek û li serxwebûnê nêziktir dike, dihêle.


Kî ci dibêje bila bibêje, sert çendî dijwar bin bila bibin, dijmin û dagîrker çendî hov û har bin, çendî serhiş, tijî xezeb û xedarî bin bila bibin, kurd statûya iro heye hew qebûl dikin, qîma xwe pê nayînîn û vê jî bi sed şiklî dibêjin, radigîhînîn.

Jiyâna bêteşe, bêxêr, bisernizmî û biserdiberdeyî mala xwe bar dike, xwe dide tenîstan û saet bi saet ji yeke'nû re cihê xwe vala dike. Ew barê ji kirêti, ji bêxîrefi û ji bêşermiyê ku bi sedan sal in li nav milen me bû, tê avêtin. Her wiha ew dema mîjîye me genî û efmîkî û dewibî bû, dilê me ne ji me re lê dida, em bi xwe re xayin bûn, çavêñ me ji bo dijmin diditîn û guhêñ me ji dijmin re miçbûn, cûn û edî neyar jî zanîn edî dê careke din venagerin.

Berî bi çend salan di hejmareke Rojnameya Milliyetê de ku niha kîjan bû nayê bîra min, Yalçın Doğan wiha digot: "Me ji xwe re li erdê mîletê ditibû: Eskej ji me re lazim dibû me deh hezar dianî, emeje lazim dibûn me ji nav bîst hezar dîneqandin, xizmetkar lazim bûna me çend hezar bixwesta kesî nedigot na.. Ev mîlet edî ne ew mîletê berê ye, ji dest me çû." Ev mîletê ku Yalçın Doğan bi liberketina behis dike û ji dest me çû dibêje, kurd in, kurdêñ iro; kurdêñ xwepêşandana Dusefordfê, gerîlayen li serê çiyan, xelkê di nav Newrozîn Kurdistan, Stenbol û Mersînan in.

Hunermend Ferhat Tunç:

Ez bi stranên getlîama Dêrsimê mezîn bûm



Birêz Ferhat Tunç pişti pê-vajoya 2 salan we kaseteke bi navê Kayip (winda) derxist. Bi giştî we di kasetê de cih daye çi?

Wekî ku ji nav jî tê fêmkirin kaset bi giştî li ser windahiyen hatiye amadekirin. Wekî tê zanîn piştî wî şerê hanê ku li Tirkîye û Kurdistanê dest pêkir, pirsgirêka şexsên winda jî kete rojêvî. Li piraniya cihanê di şeran dé gelek hatine windakirin, lê di demêñ borîde, beriya 40–50 salî. Lê mixabin iro li Tirkîye û di sedsala 21'ê de hê jî meseleya windahiyen heye, 2 sal berê li İHD'ya Stenbolê em 5 kes civiyan, di nav me de Şanar Yurdatapan jî hebû. Mebesta me ew bû ku em li ser vê mijare rawestin ka em dikarin çi bikin. Her çiqas li Kurdistanê mirov dihatin kuştin û windakirin jî, li metropolan bûyerên windakirinê hîn nû bûn. Em

gelekî li ser vê mijare sekînîn û me di dawiyê de bîryar stand ku em 5 kes her hefte roja şemiyê li ber Lîseya Galatasarayê çalakiyan rûniştinê pêk bînin. Yekemîn çalakiya rûniştinê me 5 kesan da destpêkirin. Ji wê rojê heta iro 2 sal derbas bûn. Çalakiyê ku bi 5 kesan dest pêkir û bi pêşengîya "dayikêñ şemiyê" dengekî xurt veda û ev deng ji nav şînorê Tirkîye û derbasî qada navneteweyî bû.

Dîvê şoresser şoresseriya xwe baş pêk bîne. Dîvê ajîtator ajitasyona xwe baş bike, dîvê hunermend hunermendiya xwe rast û dirust bimeşîne.

Mîna hunermendekî kurd hûn di kaseten xwe de cih didin 2–3 staranên kurdi, gelo hûn vê yekê bes dibînin an na?

Bêlê! Bi rastî jî ez gelek leqayî vê pirsê têm. Gelek earan pirsên bi vî awayî ji min tê pirsin. Ez mirov kurd im, bi kurdbûna xwe jî serblind im. Lê belê ji ber ku ez gelekî asîmîle bûme ez bi kurdi baş nizanim. Heger min baş bi kurdi bizanibûya wê tu şansê Şivan Perwer tunebûya! Baweriya min bi dengê min heye, bi taybetî ez stranên kurdi yêñ xembarî baş distirim. Lê ev heye, heger tu zimanekî baş nizanibî bi peyîvî, bi wî zimanî stirîn jî gelekî zor e. Min ceriband, di kasetâ min a borî de min stranek xwend, gelek kemasi-

yên bilêvikirinê hebûn. Lê di vê kaseta nû de straneke kurdî ku Murat Batgî nîvisandiye heye, her çiqas em li ser vê strana kurdî sekinîbin jî dîsa bi dile min çenebûye.

Zimanê kurdî ji berê ve hetanî iro ji qedexekirin û pêkutîyan nesibê xwe bi awayekî giran standiye. Mirov dikare bibeje ku sedemeke şerî iro jî ev e, lê di gel hemû pêkutî û qedexeyan jî zimanê kurdî hetanî iro xwe parastiye, lê ji bo pêşketina zimanê kurdî ku xwe bi xwe idare bike divê bi zimanê kurdî bê axaftin, bê nivîsandin, di vî warî de bi taybetî divê rewşenbir û hunermendê kurd bi awayekî hûrbîni li ser zimanê kurdî rawestin. Ji ber ku ziman her tişte gel e!

Dîvê rewşenbir û hunermendê kurd ji bo pêşvebirina zimanê kurdî werin cem hev, nîqaşan bikin. Mesela ez bi xwe baş bi kurdî nikarim xwe ifade bikim, lê ez bi tirkî baş xwe ifade dikim. Eger bi tirkî ez bêhtir xwe ifade bikim û kul û keserên gelê xwe ifade bikim, ev tişteki baş e.

Bi îngilîzi jî xwe ifadekirin baş e. Ji bo min, di zimanê muzîkê de kurdî ew

Me bîryar stand ku em 5 kes her hefte roja şemiyê li ber Lîseya Galatasarayê çalakiyan rûniştinê pêk bînin. Yekemîn çalakiya rûniştinê me 5 kesan da destpêkirin. Ji wê rojê heta iro 2 sal derbas bûn. Vê çalakiyê bi pêşengîya "dayikêñ şemiyê" dengekî xurt veda û ev deng ji nav şînorê Tirkîye û derbasî qada navneteweyî bû.

qas ne girîng e, lê di warê çand û dîrokê de û di warê xwe ifadekirinê de dîvî li ser kurdî baş were rawestin.

Hûn di berhem û staranên xwe de cih didin çand û dîroka geleni cur bi cur. Sedema vê yekê çiye?

İro ez li Tirkîye û dijîm. İro li Tirkîye kurd hene, laz hene, çerkez, ermenî, ereb û suryanî hene mozaîkeke mezin heye, cografayakeke berfireh heye. Ev yek li tu deverê ne wekî Tirkîye û Kurdistanê ye. Eger li welatekî çand û gelênen cur bi cur hebin, mirov nikare wan paşçav bike. Em mecbûr in kurewsa wan bînin ziman. Lê komara tirkî ji damezirandina cumhuriyetê hetanî iro ew netewe ziman û çanda wan "tune" hesibandiye, her cure pêkutî li dijî wan meşandiye, ji bo jiyanâ wan ci pêwist e xwestiye ji holê rake û rakirîye ji. Tişten bî vî awayî dewletê ji dixin nav aloziyan. Lê ev jî rastiyekê ji ber

vê yekê divê em li dijî van sedeman derkevin. Hunermendî û rewşenbîriya gel ne hêsan e. Em mecbûrin ku biratiya gelan di stranê xwe de binîn ziman.

Muzîka we û muzîka Zülfü Livaneli bi "muzîka xweser" tê navkirin. Lé na-vê Livaneli û Kaya jî ji otorîteyên huner û muzîkê piştgiriyê dibînin, lé navê we di liste û râporê hêzên serdest de bi "tundrawî" derbas dibe, sedema vê yekê ci ye?

● Min berê jî gotibû û vêga jî dibê-jim navê muzîka min ne "muzîka xweser" e. Ez bi tenê muzîkê çedikim, ez jî "muzîka gel" hatime. Ez bi kilam û stranê qetliema Dersimê mezin bûm, dema min guhdarî li wan kiriye, ez gi-riyame. Hunermendekî ku bi vî awayî mezin bûye, helbet wê li gorî dilê gelê xwe bibêje.

Dibe ku muzîka min û wan huner-mendê din wekî hev be, lê ez xwedî şexsiyetekê dijber im. Li dijî pest û ko-tekiyan ez tu car gavan bi paş ve navê-jim. Ez xwe weki Zülfü Livaneli û Ahmet Kaya nabînim. Ew tiştekî dike, ez tiştekî din dikim. Ahmet Kaya hevalê min e. Em gelek caran tê cem hev, lê divê hunermendê muxalif ne bi tenê di kaset û tv'yan de angô di quncikêñ roj-nameyan de muxalefetê bike, divê mu-xalefet li nav gel, di milê gel de were kîrin.

Eger gel tehdeyiye bibîne, divê huner-mend û rewşenbîr jî bibîne, dibe ku were kuştin jî ji ber ku iro li Tirkîyeyê bedela her tişti heye. Li Tirkîyeyê û Kurdistanê hetanî iro gelek rojnamevan, karbîdest, karker û rewşenbîr hatin qetilkirin angô li Tirkîyeyê aloziyeke mezin heye. Divê haya hunermend ji wan yekan hebe, mesela ez nikarim li mala xwe rûnim û stranan çebikim, ji

Ez bi kalam û stranê qetliema Dersimê mezin bûm, dema min guhdarî li wan kiriye, ez gi-riyame. Hunermendekî ku bi vî awayî mezin bûye, helbet wê li gorî dilê gelê xwe bibêje. Dibe li muzîka min û wan huner-mendê din uvelâ hev be, lê ez xwedî şexsiyetekê dijber im. Li dijî pest û ko-tekiyan ez tu car gavan bi paş ve navê-jim.

ber ku ez bi gel re me her gav ez dibin çavan de me, bi vî awayî her hal ez na-sekinim ku dewlet xelatê bide min ji bo min hezkirina dewletê hebe jî tune be jî ne girîng e. Ji bo min xelata herî mezin tewra dewletê li dijî min e.

● Iro li Tirkîyeyê gelek hunermend di-bêjin: "Ez hunermend im, lê ne siyaset-yan im" li gorî we di navbera huner û siyasetê de têkiliyeke bi ci awayî heye?

Ji hev cihêkirina huner û siyasetê ne mimkûn e. Ev zihniyet, zihniyeta dewletê ye. Dewlet bi xwe dibêje huner û siyaset ji hev cuda ye. Lé belê ew bi xwe dixwaze kû huner di şopa siyaseta wan de bimeše. Di vir de siyaset heye, madem siyaset ji hunerê cuda ye, çima dewlet dixwaze muzîk, listik, şano û her cure huner di şopa kemalizmê de be. Mirov dikare bi awayekî zelal bibê-je ku siyaseta her tişti heye. Ez dibêjim

huner û siyaset mîna qeydên zîncîrê bi hev ve girêdahî ne.

Di demêni dawî de jî cureyên muzîkê pop, caz û arabesk gelek derdikeve pêş, gelo hest û ramanê gel guherî an mu-zîka ku hûn dikin qels bûye?

● Iro dewlet politikayeke qirêj û taybet dimeşine. Çiqas tiştekî ku mirov ji civak û mirovahiyê dûr dixe tê xurt-kirin, vê yekê jî bi saya medyaya ren-gîn û derewîn dike. Asîmîlasioneke dijwar bi ajitasyonan tê meşandin. Şerê ku li Kurdistanê dibe ji ber çavan dûr dixe çawa ku tu tişti nebûye. Iro di ma-la her kesî de televîzyon heye, radyo heye. Her roj dibêje 50 gerîla hatin kuş-tin 10 leşker şehîd ketin, çawa ku tiştekî ji rîzê didin nîşan.

Her wiha gel jî bi vî awayî li bûyera mîze dike an jî qezeyê trafikê çedîbin 60 kes dimirin rî û cade bi laşen miriyan tîji bûne, lê ne xema kesî ye. Ji ber ku gel xistine nava psîkolojiyeke wiha. Civakeke bi vî rengî, civakeke erjeng e. Ev yek tev bi saya muzîkê tê kirin, bi saya futbolê tê kirin. Her xebata ku mirov ji bîr û bawerîyan, ji hezkirina mirovan dûr dixe dixwazin bixin mejiyêñ xelqê; dixwazin mirovên robot biafirîn. Tu kîjan kanala televîzyonê vedikî tu dibîni ku 9-10 hunermendê pop-caz û arabeskê tê de hene. Muzîka popê xulamiya sistema tîrk dike.

Lê em jî xurt in. Wê rojê li Edeneyê li hemberî 20 hezar kesî min konser da, li Mersinê min du konser li ser hev dan, kesê ku xwe nespêre gel jiyanâ wî jî na-meşe.

Birêz Tunç wekî tê zanîn di 15'ê ge-lawêja 1996'an de ji hêla fermandari-ya hêzên bejî yêñ artêşa tîrk ve (KKK) li gel navê gelek sazî û rîexistinan navê



Li rastî komployekê hat, dibe ku ew bi-kustana jî, lê gava nikarîbin yekî ji holê rakin, komployen bi vî awayî tînin serê wî. Cara dawî em dikarin bibêjin qewimîn û bûyerên bi vî rengî ji van raporan ne dûr in.

Tehditên bi ci awayî li we dîbin?

● Ez sê salan bi awayekî rîkûpek hatim tehdîtkirin, bi nameyan, bi tele-fonan hatim tehdîtkirin. Belkî hûn dizanîn di nûcyeke radyoyê de hate gotin ku "Ferhat Tunç

hatiye kuştin" ez li Almanyayê bûm telefonek hat, min bawer nekir. Xebera kuştina min li herdeverê digeriya. Ji Stenbolê çend rad-yo bi tele-fonê li min ge-riyan, faks ji w.a.n r.e.h.a.t.i-

tin. Edî wê şevê bi radyoyan re li ser mirina min em rûniştin û me xeber da, me der heqê "mirin hesteke çawa ye" de xeber da. Ev bi xwe jî şerekî psîko-lojik e, xeberek derdikeve li her derê belav dibe. Armanç xerakirina psîkolojiya min û gel e. Lê pişti bûyera susur-lukê tehdit qut bûn. Ev têkiliyên gemarî ku mirovan ji holê radikin, bi inisiyatiifa dewletê û saziyan bixwe pêk tê.

Gelo konserê we wekî berê hê jî qede-xe ne li hin deveran.


● Belê iro li Tirkîyeyê û Kurdistanê li gelek metropolan ez konseran nadim. Pişî 3 salan hê bi zorê min konserek li İzmîrê da. Normal e ku destür nedin. Ji ber ku rapora wezareta karê hundurîn jî der barê vê yekê de hatibû weşandin. Digotin divê rî li ber van sazî rîexistin û şexsan were girtin. Waliyên bajaran jî li gorî van talîmatan tevger dikin. Li gorî xwe kî bi talûke bibînîn faaliyet û çalakiyêñ wî qedexe dikin. Iro li gelek bajaren Kurdistanê kaseten min bi awa-yekî keyfi û bêyî bîr yara dadgehê têne destserkirin. Mesela konseren me qede-xe dikin. Li ser vê yeke em dozê vedi-kin û dozê kar jî dikin, içar wâli radi-be qanunekê derdixîne pêş.

Cara dawî hûn der barê Azadiya Welat de dixwazin ci bibêjin.

● Belê her çiqas ez A.Welat naxwî-nim jî; ez wê takip dikim û diecibinim. Lî jî iro û pê ve ezê hewl bidim xwe ku nivîsîn kirmancî (zazakî) bixwînim.

Kasetta Ferhat Tunç ya nû y e
kişandan, goti-ne Ferhat Tunç hatiye kuş-

**MEMED DREWŞ
SALIHÊ KEVIRBİRÎ**



Hinek wêne ji helbestên Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, bi kurtî Şâhî evinê û dildariyê ye di helbestên kurdi de. Ew şexê helbestvanê kilasî kî ye Şahsiwarê Şeyda ye ku evîna xwe bi hesteke tenik di penava malikên helbestan de diyar kirîye.

Dîrokavân ne li hev in û cuda ne li ser mîjûya bûyîn û mirina wî, wekî ku nivîskar cudane li ser şirovekirina na-veroka helbestên wî.

— Mebesta min ji' vê babêtê nedî-yarkrina jiyana wî ye, hew bi kurtî şirovekirina çend wêneyan ji malikên helbestên wî ye.

Wanekirin:

*İro ji derba xwencerê Lazim bi eşanî
mela
Tişbihî zulfa dilberê Zanim
perişanî mela.*

Daxwaza Mele ji van her du malikan diyarkirina êş û jana ku cigera wî sotîye û ev wêneya herî bilind e ji ber ku perişaniya Melê durist xuya dike. Çawa ku biskêni dilberê li ser rûyê wê şerpeze bûne, wiha jî her hevduyek ji biskêni wê Mele perişan dike.

*Subhetî çengê dinalim hîj ji dest
daxa qedim
Herweki meş disojim dost nizam
ageh heye*

Mele dide xuyakirin ku Dilberê ji berê ve tîrîn evînê li dilê wî dane û ew wekî pêtê tê sotandin. Lê nizane ku hay jê heye an na.

Mele di vê malikê de dinale weke çengê û nalîna Mele bi zîzbûna çengê

awazeke wekî hev didin.

*Min di baxê gulfiroşan di êceb
rismek xerîb
Xarî teban gul di destin
gulperestan xare bes*

Di vê malikê de mele dest bi babeteke nû dike ew jî biyaniya cuda kirina bextan e.

Wêneyê herî çak ew e ku mele xuya dike xwedî sinciyêna baş istirî û xare di destan de, lê xwedî sinciyêna ne baş gul di destan e.

*Gelo dîsa bibînim ez çiraya
westletê hilbit
Bisojin şubhî perwanê di ber wê
nûr û şeqê da.*

Mele di vê malikê de hêvîdar e ku careke din yara xwe bibîne û ağıre evînê ji nû ve hilbîbê di navbera wan de ta wekî perwan bişewite li hemberî ronahî û rewşena rûyê dilberê.

*Guh de zîkiri hal û coşa badeyê
wê bi bilbil ra dixwent bilbile.*

Mele di vê malikê de wêneyekî nû dide xuyakirin, ew xwiş xwiş û coşanda badê di kûz de, bi figana bilbil re.

Mînakeke herî bilind e ku coşandina badê bi figana bilbil re dengekî nemaz dide.

*Sehergeh êndlîbe mestin ji bîhna
werd û bîşkôjan
Subhetî tûtak û kuynan dinalin em di
firqê da.*

Mele di vê malikê de demeke çak hilbijartê "seher" nîvê şevê, ew dema ku canê mirov û xwerist dibine yek.

Ü her wiha dibêjê: Di nîvê şevê de bilbil serxweş in ji bîhna gul û çiçekan, li hemberî vî wêneyî wêneyekî din dide xuyakirin; çawa ku tûtak û kuyîn dinâlin wiha jî mele û dilbera xwe dinâlin ji dûrkîtinê û cudahiyê

*Ger ne teşbihî du birhîn tebitin
Me di idan bi hilalê ci xerd.
Ne ku sermende
ji riwê te biwa
Afîtabê bi zewalê ci
xerd.*

Di malika pêşîn de mele dide xuyakirin ku ew dimîne bendewarê cejnê (iydê) ne ji bo (eydê) lê ji ber ku heyva eydê wek kivanê her du birhîn dilbera wî ne.

Ü di malika diwem de dîsa mînakeke herî bilind heye ewe ku roj ji şerma rûyê dilbera melê siphî diçe ava, gelo dilbera wî çendî şepal û şox e ku ji ber ronahî û rewşena wê roj diçe ava.

Di dawiyê de min divê bidim

zanîn ku ne bi gotarekê û ne bi pirtû-kekê mirov dikarê mafê wênekirina helbestên melê bide, ji ber ku helbestên wî wekî deryayeke bê perav in.


Ü malikên min, niha şirove kirine wekî gulekê ji gulistanâ Mele ne û tu cara gulekê şûna gulistanâ negirtiye, mebesta min hew. Mele bi xortan bina-sînim, ta vegeerin helbestên wî yên şîrîn bix-wînin.




BEZAR KOBANI



Dîmenen ji turbeya Melayê Cizîrî ku li Cizîrê ye





Li navêndê çandê çalakiyên vê hefteyê

LI Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbole

● 4.05.97 Yekşem: Ji Bekşavê Mehmet Özer, şîr û nişandana DîA'yê, saet:14.30

Konsera Ozan Hogir, saet:18.00

● 7.05.97 Çarşem: Sohbeta li ser "Di sala 2000 kêm 3 de Kûba", ji Zanîngeha Azad Murat Akincilar, saet:18.00

● 9.05.97 İn: Filmê 'Baba', Yılmaz Güney, saet:18.00

● 10.05.97 Şemî: Konsera Koma Amed, saet:14.30

Konsera Beyhan Aksoy, saet:18.00

LI NÇM'ya Izmirê

● 4.05.97 Yekşem: Bi dengbêjan re şevbîhîrk; Ozan Cezmi, Amdulselam, Süleyman, H.Mehmet, saet:18.00

● 10.05.97 Şemî: Roja aşûreyê (wê aşûre bê belavkirin), saet:14.00 Konsera Ozan Ali Taş, saet:18.00

LI BEKSAV'8

● 6.05.97 Şemî: Bîranîn: 'Ji 1886'an heta 1996' em şehîdîn 1'ê Gulanê bi bir tîmîn, saet:19.00

Dram: Tyatro Imge,

Konsera Yenigün Müzik TopluluğuŞîr: Mehmet Özer/Suna Aras

● 10.05.97 Şemî: Konsera Koma Amed, saet:19.00

AWIR

Divê Heskîf bê jiyandin



Dewlet ji bo berjewendiyêñ çand û dîroka gelan ji bo ku 50 sal ji Bendava Ilisuyê fêdê bigire, bajarekî mîna Heskîfê, ku muzexaneyeke servekirî ye binav dike û ji holê radike. Her wiha ne tenê li herêmê li metropolan jî qetîlama dîrokê heye.

R oja 28'ê avrêlê li Komeleya Mafêni Mirovan Şaxa Stenbole ji hêla "Komîsyona Mafêni Çandî" ve çalakiya pêşendeyâ (pêşandan) DîA'yê bi navê "Hasankeyf Yasatîlmalî (Divê Heskîf bê jiyandin)" hate lidarxistin.

Di çalakiyê de 87 wêneyênu ku ji hêla çend wênekêşan ve di sala 1993'yan de li Heskîfê û derdora wê hatibûn kîşandin, bi tevî keserên mîvanan hate temâsekîrin.

Di wêneyan de gelek dîmenênu cur bi cur û bermahiyênu xwezayî ku wê di bin ava Bendava Ilisuyê de bimîne tevî zatokên çavşîn û porzer jînîn li beravê û kal û pîr ên di şkeftan de bala mîrov di-kişand ser xwe.

Wêneyênu pêşendeyê ji hêla çend wênekêşen bi navê Gültekin Tetik, Nur Uslu, Şadiye Çetintaş, Yıldız Üçok, Sevil Üzrek û Işıl Yıldırım ve hatibûn kîşandin.

Li ser navê hevalên xwe, Gültekin Tetik pêvajoya çûyîna heyetê li herêmê wiha tîne ziman: "Em di sala 1993'an de çûn herêmê, wê demê agirbest xera bûbû û PKK'ê 33 leşkerên tirk li Bingolê kuştibûn, ji ber vê sedemê em li

çend deveran ji hêla hêzên leşkerî ve hatibûn sekinandin, digotin hûn çîma hatine, hunê herin ku derê?" Lî ji bo vê xebatê gelê Heskîfê Bendava Ilisuyê û tewra gel û dewletê li dijî tunekirina çanda kevin ji wiha dibêje: "Ne bi tenê li herêmê, li metrepoleñ Tirkîyeyê jî dewlet ji bo berjewendiyê demeke kurt be ji, ji bo başiya gel, çand û dîroka gel biryaren erêni nastîne."

Ji bo ku 50 sal ji Bendava Ilisuyê sûd û fêdê bigire, bajarekî mîna Heskîfê ku mîna muzexaneyeke servekirî ye ji holê radike." Li gorî gotina Tetik, dewletê gelek soz dane gel ku wan di xanî û avahiyê modern de bi cih bîkin, lê heta iro tu sozê xwe neanîne cih. Dîsa Gültekin Tetik dide zanîn ku gel li dijî jîholêrakirina Heskîfê reaksiyonê ke tûj nîşan dide, lê tu tişt ji destê wan ji nayê.

Her wiha Tetik diyar dike ku bi tenê li Heskîfê 5000 şkeftên ku gelek malbat tê de dijîn jî, wê ji vê nebaşiyê ne-sîbê xwe bistînîn.

Di dawiya pêşendeyê de ji bo Heskîfê kampanyayeke imzeyan jî hate deshpêkirin.

SALİH TAŞKESEN

TÎSK

BEKİR BAHÖZ



Mangirtinî gîrawanî siyasî

L em kotayî şedey bîsteme da, gelî kurd û turk le Tirkîya û le bakûrî Kurdistan, jiyanî pir le şeref û azad be nirxî giran dekirin. Hendê cêga heye narezayî komelayetî û neteweyî be zînduyî tê da denêjîrê, ew cêgaye, nawî zîndan e. Salanêkî dûr û dirêj e kurd be wişey zîndan aşnaye. Zor in ew kesaney be tûnêle teng û tarîkekanî zîndan da biran û idî rojî rûnakiyan nedîtewe. Zor in ewaney heta diwa henase bergiriyan kird û tenant be dirkandinî yek wişes, napakiyan neniwand. Zor in ewaney be sûtanî leşî xoyan, tarîke şewekanî zîndanekaniyan rûnak kirdewe. Le her welatêk û le her cêgeyak ke le pînawî azadî û serbexoynî da têkoşan hebêt, lew cêgaye, zîndanî bunyad denrê.

Ewey min demawê lîra da basî bikem, zîndanekanî bakûrê Kurdistan û be tay-bîş zîndanî şarî Amed e, çûnke bê nawhênanî Zîndanî Amed, mîrov natwanêt wêneyekî rûn le barey zîndanekanî bakûrî Kurdistanewê bidat be desewe. Zîndanî şarî Amed, qelay xoragîr û qaremanî lawekanî gelî kurd e, ew lawaney le pînawî komîlgayekî yeksan û azad da giyan î xoyan debexsin. Zîndanî Amed, dubustanî pêgeyandinî kesanî şoreşer û maşperwer e.

Diway kudetay serbazî salî 1980, Zîndanî Amed bû be nîşane bo encamdanî kar û reftarî dûr le hemû core rewîstêkî berzî mîrovayetî. Diwa be diway ew kudeta negrîse, deyan hezâr mîrovî kurd, be biyabanûy beşdarî kirdin le têkaşanî rîzgarî netewayetî Kurdistan da, xirane Zîndanî Amed ewe. Ew gîrawane rû be rûy dirindanetîn şewey azar û eşkence debûnewe û êstaş her ew rewse berdewam e, ewe bû salî par, 10 gîrawî siyasî ser be Partî Kirêkaranî Kurdistan lew zîndane, kujran.

Amanc le hemû ew eşkence û azare, şîkandinî wirey berzî gîrawan û kuştînî xwastî azadî bû le naxyan da. Belam gîrawanî siyasî kurîd hergîz seryan şor nekird û hemew diwaş ser şor naken bo ew zûlm û zorey dij be ewan piyade dekrê.

Helbet gewretirîn çek le desfi mîrovî gîraw û zîndanî kiraw da, mangirtin e le xwardin. Gîrawanî zîndanekanî bakûrî Kurdistan û Tirkîya, par penayan bo ew çêke bird û le encamî mangirtinêkî kiraw da, jîmareyekî zoryan geyistin be karwanî şehîdan.

Kaşî êstaş, gîrawan le çend zîndanî destyan dawate mangirtin, ewan hemise dupatî dekenewê ke amade ne le pînawî be dest hênanî mafekanyan da, gîyanî xoyan bekti bikin.

Ewan dawa deken gûşarî sextî ser gîrawan la bibrêt û wekû dîşî şer hels û kewtiyâr, legel bîkî, be kirdeweş selmandiyan ke ewan bakiyan le mîrdin niye. Gîrawanî siyasî le pînawî ew erke pîroze da şîwênekanyan bîkî be baxçey gûlîzîzar

Piling

Rojê, qama xwe bilind kir û tîrêjên xwe bi germayî, berdan nav deşt û çiyayê Kurdistanê. Li xwîsiya pelên nefel û tolikê, ronahî şikest û wekî libên cewher li ser rûyê wê geyayê, rengin çîrisardin.

Ev ne roja yekemîn bû ku rojê digirt ser deşt û çiyayê Kurdistanê û bêhn bi sosîr û beybûnê wê dixist.

Adarê û rojê, bi hevûdin re dest bi xeml û şenga wê kiribûn û roj bi roj berfê xwe ji ser gelîyên çiya, ji ber dida alî û tîrêjên wê li ser zinara kim dibûn. Wilo jî, şînahiyê xwe di dewsa wê de pehn û fireh dikir û bi taybetî li ser çiyayê Agirî.

Germa rojê, libelib ji milavên qesayê yên bi tayêjka heval Azad ve, dianîn xwar û libên jê, bîrondî dirijîyan ber kulîlkîn nîsanê, yên nûşîn.

- Çaxê bêriyê ye!..

Heval Azad, di bin tayêjka xwe de, pişti ku xwe vemitand, bi dengekî xunâfi ji heval Fîrat re, wilô got:

Heval Fîrat, di cihê xwe de rûnişt û tayêjka xwe, li newqa xwe da hev, ji bo di germê de bimîne û li heval Azad ma guhdar kîlikâ ku careke dî got:

- Kefâ ser rûyê şîrê xav, em li hêviya wê bê aram diman!..

Heval Fîrat, li heval Azad vegerand û got:

- Ü binê beroşê, ji şîrê kizîrî.

- Wekî mitirbîn ku, deriyê şikeftê li wan hatibû girtin, li me hatiye!..

Heval Azad bi kenekî sivik ve, ev babeta han got.

Heval Fîrat, dengê heval Azad wilô kir, xwe ji nav tayêjka xwe avêt û ji kel rabû ser piya û bihêrs got:

- Na heval Azad, ew hunermendêñ kurd bûn, deriyê şikeftê li ber wan hatibû girtin û bêdelîl bûn. Lê, te wekî ayleyekî (eyloyekî) baz, li ser çiyayê Agirî berbendî agirê Newrozê, xef vedaya. Heval Azad, bi şermezayê ji nav tayêjka xwe rabû û bi danheva êzingê agirê çayê, xwe jê dûr xist. Agir kir û çaydan çayê danî ser û bi hevalen xwe re, bi paqîkirina çekêñ xwe û axeftina li ser êrîşê, roja xwe qedand.

Heyvî di vê şevê de, di nav pelên



Ev bêrîta ku li jêr, dema bûkê radîkin dibin mala zavê tê gotin.

Hey gul, hey gul, hey gulê
Govenda bûk û zava
Dem déma gul bişkiftin
Govenda bûk û zava
Pêjanokan hilmiştin
Govenda bûk û zava
Gulzeryan diyarî hiştin
Govenda bûk û zava
Reşkezî di ranê stûr de
Govenda bûk û zava
Sahiye di mala mîr de

Govenda bûk û zava
Hey gul, hey gul, hey gulê
Ew gula gelîyê şaxê
Reşkezî ket kemaxê
Govenda bûk û zava
Şahiye li mala axê
Govenda bûk û zava
Hey gulê tu oldaş i (emin i)
Govenda bûk û zava
Poşiyokê bike şasî
Govenda bûk û zava
Bêbextê ji dewrê paşî
Govenda bûk û zava
Hey gul, hey gul, hey gulê

Ewran re ronî da û pê re jî pirûzkêñ agir hin bi hin, li ser çiyayê Kurdistanê bi banî de pijiqîn û remiya wê li ezmâna ges û bilind bû û gelê kurd pê re cejna Newrozê pîroz dikir.

Lê, hevalên ARGK'ê, yên bi heval Azad û Fîrat re, xwestin ku cejna xwe bi rengekî din pîroz bikin. Lewma jî, li ber alayêya tirk dav vedabûn.

Heval Fîrat, bi du hevalên din re, li ser cihekî bilind, qermê xwe li hemberî alayiyê berdan erdê, da ku pişta heval Azad û koma pê re, di êrîşê û paş ve kişandinê de, bigirin û wan biparêzin.

Sev, qar bû û kîlî bi kîlî, çû bi ser roja Newrozê de, hîn rojê hewl dida xwe, da bê ava, pêre pêre heval azad bi koma xwe re cîhan li dijminan dizüt (disot) û ew di nav remiyê kirin, dengê berê tifinga di nav wan de di îlîland û zirtêñ mîra re, tevlî hewar heware dijmin dibû.

Ronahiya ber roj hilat, ser rûyê erdê digirt û heval Azad hîn, canê dawî ji dijmin dixwest. Lê, divê kîlekê de, tanka leşkeren tirk hat der û berê xwe da bi ser koma heval Azad û bêhin li wan teng kirin!..

Mîranî, di nav kurdan de, bi danê hatiye nas kirin, çi bi can û çi bi mewdan. Lê, dînemîr jî ewêñ ku, ne tixûb û ne ban, ji dana wan re heye?

Heval Fîrat, dît bi çawa koma heval Azad, kete tengasiyê, pir pê ne dibêjinê. Lewre jî, wekî piling, xwe berda pêsiya tanqê û bi çekê xwe yê sivek, şerê wê kir, tanqê berê xwe guhert û bi ser heval Fîrat de çû û wekî ku, wî dixwest.

Heval Fîrat, nehîst ku tanq xwe set rast bike, ji ber ku bi lez xwe avêt serû her du bombêñ di destê xwe de, pê de peqand!..

Xwîna heval Fîrat, bi qetê tanqê re bijiqî û li ser rûyê erdê bela bû, bi dilopên xûnafa hûr re, ser rûyê erdê şû dikir û xwe berdida ber rayêñ (rehêñ) kulîlkîn nîsanê û bi rengê sor nû şîn dihatêñ. Li Kurdistanê bela dibûn û her xaniyek pê dihat xemilandin. Lewre jî, Newroz li Kurdistanê bi kulîlkîn sor, tê pîroz kirin û heya wekî iro.

ABBAS-M-ABBAS

Hey gul tu esmer i
Poşiyokê bike serî
Govenda bûk û zava
Bêbextê ji dewra berê
Govenda bûk û zava
Hey gul, hey gul, hey gulê
Esmerê nazê gulê
Govenda sil û mil e
Govenda bûk û zava
Çavê reş tijî kil e
Govenda bûk û zava

Berhevkar:
RÊBER RONÎ / QILABAN

Daweta Bûk û Zava

Di wêneyêner gerokêner rojavayî de kurd

Jî hêla Mezopotamien Verлага ku cihê wê li Kôlnê ye, berhevokeke bi zimanê tirkî, bi navê "Batılı Gezginlerin Seyahatnamelerinde Kürtler (Di seyahatnameyên gerokêner rojavayî de kurd)" hatiye weşandin. Di pirtûka ku ji hêla nivîskarê tirk İlhamî Yazgan ve hatiye amadekirin de li gel nexşeya Kurdistanê, plan û nexşeya Musulê, plana bajarê Ruhayê û plana derdora Amedê ku di sedsala 18'an de hatine çêkirin jî heye. Di pirtûkê de digel hev 121 wêneyen çêkirî û fotograf cih digirin.

Di destpêka çapa yekemîn a pirtûkê de wiha hatiye nivîsin "Ji bo bîranîna ew kesen ku ji bo azadiya netewaya kurd bûne pakrewan"

Naveroka pirtûkê ji hêla wêneyan ve zehf dewlemend e. Ji wêneyen kurdên zaza bigirin, hetanî

kurdên Celalî, kurdên misilman û xristiyanen Amedî, kurdên Hezroyê û papazê Dêra Axtêrmanê, konê kurdan, zozan û çandiniya kurdan, şekl û şemalên kurdan, jînê kurd, jînê li ser kaniyê, jînê asûri, ermenî û tirkmen, guhar, gustûl, bazin, gerdaniyê jinan, beg û mîlisê kurd, meşka kurdan, jînê axayê kurd, daweta suryaniyan, eşîra celalî, çiyayê Araratê, nêçirvanîya kurdan, mîr û begê kurd, leşkerên Seleheddinê Eyyubî, Qazî Mihemed, Parlemana Qazî Mihemed tevî wezirê xwe, çekên ku kurdan û kar anîne, ji rojhilate Kurdistanê siwariyê kurd û ji başûrê Kurdistanê wêneyen pêşmergayan ku piraniya wan di sedsala 17 û 18'an de ji hêla gerok û kurdologan ve hatine kişandin, mirov ji bo demekê be jî dixe nav nostaljiyeke kûr û dûr. Her wiha di pirtûkê de

tûkê de Pira Malabadê, Qesra Isheq Paşa, ji qompleksa Isheq Paşa mîmariya mizgeftekê, di nava rûpelên pirtûkê de têr dîtin. Disa di heman pirtûkê de gerokê danîmar-Ki Çarlsten Niebuhr bi cil û bergê kurdî, gerokê Macar (li nav Osmaniyan bi navê Reşit Efendi dihate naskirin). Herman Armînus Vambery, Mîrdîna kevnare, bermayıyîn li Mîrdînê, ji objektîfa rojhi-latnasê alman Hofmaîster "li Nisêbînê kurdên li qehwxaneyê", sûr û bedenê Amedê, çem û pira Dîcleyê, paytexta Asuriyan Nînova, Bedlîs û Kela Bedlîsê, Sipanê Xelatê, li Xelatê Kumbeta Emîr Bayindir, gelek mizgef û dêr, Kela Xoşapê, Wan, li Ruhayê Gola Masiya, derwêşen Ruhayê, li Ruhayê qereciyê Qurbatin, Herran, li Ruhayê Dêra Sor jî bala mirov dîkişinin ser xwe.

Pirtûk ji bili wêne, nexşê û krokiyan ji hêla çend nivîsan ve ji şayanî xwendinê ye. Çend ji wan ev in: "Di têbîniyê mîfsyonerê frensî de kurd", "Efsaneyâ Kara Fatma", "Begê kurd ê nêçirvan", "Şalwar û xencerâ begê kurd", "Manguran: Eşîra ku nehatiye asîmîlekirin", "belgeyek", "Bedlîs", "Kela Begê Kurd: Xoşap" û "ağır dibe gul û av"

Pirtûk 280 rûpel e û bi temamî ji wêneyen reş û spî pêk hatiye.

*Navnîşâna Xwestînê
Verlag und Vertrieb GmbH
Stolberger Str. 200/50933
KÖLN / ALMANYA*

SERWÎSA ÇANDÊ

vê pirtûka hêja. Wî zanîbû ku miletê kurd hewceyî pirtûkeke ji. vî rengî ne û valahiye heyen divê wêre dagirtin. Ew di rûpela 3'yan de dibêje: "Hate bala min-ku ez pirtûkeke cuda di vî warî de binivîsim, ku berê tu kesî bîr nebiriye ser (...) û ez nav lê bikim" "Şerefname" da ku nav û dengê malbatê kurdî (yên xwedî teşîreke germ di jiyanâ Kurdistanê ya gelemeperî de) di pişt perdeyêneşartî de nemîne.

Tîstê ku bala mirov dîkişîne, bêhtir ew e ku her du nivîskarîn me yên mezîn; yekemîn nivîskar bûn di dîroka nivîsa kurdî de ku her yekî riyek ji babetekî re vekir, em dikarin bibêjin Şerefhan bavê tarîxa kurdî ye û Xanî bavê destana kurdî ye.

Tîstê hîn bêhtir bala mirov dîkişîne ew e ku nivîsandina herduyan nêzîkî hev e û bi yek terz û şêweyî pêşgotin ji pirtûka xwe re danîne. Heta em dikarin bibêjin gelek malikîn Mem û Zînê wekî çend heyokê Şerfenameyê hatine û di hundirê vê gotarê

Pêkhatina nasnameya kurdî

Pirtûka lêkoliner-nivîskar Dr. Naci Kutlay, di nava weşanen Belgeye de, bi navê "Kürt Kimliğinin Oluşma Süreci (Pêvajoya pêkhatina Nasnameya Kurdî)" derket. Min ev berhema Naci Kutlay, di bêhnekê de xwend. Wisa dibêjim, lewre pirtûk bi naveroka xwe, dîroka nasnameya kurdî ya 200 salên dawî bi zimanekî herikbar şirove dike. Yenê vê vejêrê bixwîne, tenê dîroka nasnameya kurdî nabîne, ligel vê jî dîroka çapemeniya kurd, pêvajoya bûyîna ramyariya kurd jî cihê xwe digire di nava rûpelên pirtûkê de. Li gorî Dr. Kutlay kok û asasê nasnameya kurdî wêjeya kurdî ya devkî ye û jixwe ev jî zimanê kurdî ye.

Ji hêla din ve nivîskar Kutlay, bûyeren van 200 salên dawî bi awayekî balkêş radixe holê û têkiliyên bûyêren ramyari bi rewşa Tîrkiyeyê ya aborî ve girê dide. Lî, bî nerîna min ev têkili hinekî qels hatiye nîşankirin. Li ser vê şiroveyê, çavkanî jî têr nehatine rédan ji aliye nivîskar ve. Dibe ku niqte ji aliye nivîskar ve pir girîng nehatibe dîtin, ji ber ku mijarê lêkolînê siyast ye.

Pir balkêş e pirtûk jî gelek alî ve. Niqteyeke girîng a din jî di pirtûkê de mirov fen û fûtûn Mistoyê Kor û xapînokên İsmetî Ker ên ku anîne serhe gelê kurd xwe dibine. Dr. Kutlay, ji vê hêlê ve jî, traşıya dîroka gelê kurd tîne pêş çavan.

Tevî hemû tiştan, ez dikarim bibêjim bêpesin ev pirtûk berhemeke hêja ye ji alî naveroka xwe ve û bi kedeke mezin amade bûye. Ji bo ku mijar ronî bibe, li gelek çavkaniyan hatiye nîhîtin. Birêz Kutlay, peywîreke pîroz jî aniye cihî û mafê telîfê û diravê (pere) ji firotina wê were, daye Komela Mafen Mirovan.

FEREÇ ÇOBANOĞLU



Derleyen ve Yayına Hazırlayan: İlhamî Yazgan

Di navbera Şerefhan û Ehmedê Xanî de

JAN DOST



Serefhanê Bedlîsî û Ehmedê Xanîye Bazidî du berhemên hêja û binîrx li pey xwe hiştin. Bi rastî dema mirov heci du berheman dixwîne û dide ber hev, dibêje qey ava yek kaniyê ne û siya yek darê ne. Her du zanayêne mezin xwedî yek proje bûn û dixwestîn karekî baş û xizmeteke ku ji bîr nabe ji bo miletê xwe bikin û bi rastî jî kirin.

Yekî ji her duyan (Şerefhanê Bedlîsî) pirtûka Şerefname nivîsand. Dîroka miletê kurd, mîrîn kurd û jiyanâ wan, mîrnîşînen li Kurdistanê, sazbûna wan tevde xistin nava

'de emê mînakan bînîn û wan bidin ber hev, da ku em bigîhîjin rastiya ku Şerefhan û Xanî xwedî yek projeya ramanî bûn, di tarîxa kurdî de wekheviya ramanen van her du nivîskarîn me yên mezin, mî digihîne vê encamê ku Şerefhan bingeh jî fikra neteweyî re dâñî û Xanî hat li ser ava kir û ew fikr zelaltir kir, di demekê de ku hin milet û neteweyen împeratoriya osmanî di xewa şerîn de bûn û eger em bêhtir nêzîkî rastiye bibin, emê bibêjîn di xewa tehl de bûn.

Lê cüdayî ya di navbera her du nivîskaran de ew bû ku Seydayê Xanî Mem û Zîna xwe bi zimanê kurdî nîyîsand û doza hişyariyê li miletê xwe kir û sefewî û osmanî wekî dijmijen kurdan bi nav kirin, di dawiyê de em dibêjîn! Mirov dikare bêhtir li ser fikr û ramanen van herduyan lêkolînan çêbîke û bi vî awayî sala Şerefhan dibe fersendeke hêja ji bo danasîneke mezintir ji fikra neteweyî re ya kû berî çend salî di nav kurdan de derket.

Hecî Fahd, (hecî) 5x5 an jî bi kurtasî hechecik

Li ser çûna hecê gelek, metelok
û pêkenok di nav get de hene.
Ew awayê mîzaha gelêrî xweş
didin diyarkirin.

Bo nimûne li Kolikê zilamek hebû jê
re digotin: "Hecî Entep", lewre wî
amadehiyâ xwe kiribû ku here hecê, li
Dilûkê problemek derketibû pêşberî wî
û ew ji sinor vegerandibûn, gel jî ew
nav lê kiribû.

Dîsa demekê ji bo ku heywanêن qurbanê li Mekeyê serjê bikin û nehêlin ku goşt û eyarê qurbanan li tunê (bere-dayî) here, komek mirov bi yewmiye biribûn Mekeyê, ew di wê navê de bûn hecî ji, lê di nav gel de ji wan re “Hecî post” dihate gotin.

Heke mirov li gorî vî mantiqî bifiki-
rî, Serokwezirê Tirkîyeyê Necmettin
Erbakan û malbata wî, ji ber ku ji kîsê
Qral Fahd bûn "heci" navê wan jî dibe
"Hecî Fahd".



5X5 Necmettin Erbakan

Lê' eger hûn bibêjin kekê min, em j
ku zanin van formulên ecêb bixwînîn
Hûn dikarin bi kurtasî bibêjin: Heche-
cik Necmettin Erbakan. Lewre heche-
cik jî her sal dema zivistan tê berê xwe-
didin Erebistanê û li gorî baweriya ge-
dîbin hecî. Jixwe navê wan jî ji vir tê
(Bila mamoste Zana Farqînî ji me bibo-
re, ji ber ku me ji bêgaviya rewşa w
bêbavî, dest avêt warê pisporiya wî u
tevî ku ne warê me ye jî, me ew peyyâ

dahûrand.

Ger em ne xelet bin navekî din ê w
tilûrî "dûvmeqese." Em bawer dikin k
ji wî alî ve jî rewşa Erbakan dişibe rew
şa wî, lewre dema ew li hecê bû, gene
ralekî tirk devê xwe avêt; dûvê wî û ev
wekî devê meqesê (bi awayê ku kurdê
Binxetê dibêjin çawbirê) kir du seq. J
ber vê sedemê heke yek bibêje Dûv
meqes Necmettin Erbakan jî dibe.

Em bawer in, me gotina xwe gelektirêj kir, lewre wekî her car pêwist

ku em helbestekê birijînin ser kaxizê
Strana hechecikan
Hechecik ref bi ref in
Bi zirne û bi def in
General li wan bi gef in
Werin diyarê heciyan
Hechecik dûvmeqes in
Kî nizane çi kes in
Bi çengî, reqas in
Binérin li dojehiyan
Hechecik bi balafir in
Bi derew û bi vir in
Bi bîlîta bihuştê
Reyên gelî dikirin
Guh bidin guregurê
Dapîr, bapîr, nêvî, kur
Keç û zava, das û tir
Xwîna gel dîkin sîrfir
Werin benda xwîmîjan
Hechecik li qesra keyan
Sûc xuya ayan beyan
Notirvanê pergala seyan
Bawer nekin ji tûretûrê
Tûretûra ku tê bihîstin
Zûrezûra guran e
Marezer, û hechecik
Ew xweş xwişk û biran e
Yekîtiya wan kesan
Tim li dijî şeran e.

QELEMŞOR HECNAS

BIXELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (66)

XACEPIRSA

Deutschsprachige und kaukasische Vornamen	T	Cognitiv Dimension	R	SL-Gatten der Persönlichkeit Dimension	A	Detail Nawat Bina	E	Autonome oder Kontrolle Stilistik	T	Other
MURAT	U	↓	R A T	B Ö Z	↓	L A K	↓	K		
Mauritius Name	R	Ü	K O	R I N	↓	O	↓	Names Geschenk		
Markt	I	N	↓	N A M Z E T	↓	↓	↓	↓	Kinder gewünscht	
Elternname Nameyra	K	E N	↓	S E	↓	↓	↓	↓	↓	D
RE	Wawat Bina	↓	E M O	Plinghrik wirkt	↓	K È S E	↓			
Geschenk Namekunde kaukasisch	K A R I	↓	↓	Reyhan Kombination	↓	S E	↓			
S	Psi-Autismus ↓	j	↓	W I N	↓		↓			
Therapie Formen	M A K	↓	X	↓	↓	A R	↓	Therapie		
SALMAN	A L M A N	↓	↓	↓	↓	P	↓			


Bersiva Xacepirsa 64'ar

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv
bığihijin me, emê wan
binirxînîn û bi riya pîskê li 5
kesan belav bikin. Xelata
hejmara me ya 66' an Kürtçe
Dîlkilgîf

Bhongsi
Jerenot:

Ji bo ku bersiva 'we bē

"Peyva Veşarî" di na
qutiyên li bin xaçepirs
binivîsin û tevî navniş
xwe ji me re bişînin.



PEYVA VEŞARI

(1) (2) (3) (4) (5)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerfinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpirsê Karê
Nivisaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYIYÊN ME
(Temsilcilerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:

M. Rojava
Suriye:
Jan Dost
Helifm Yüsiv
Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695
Hannover:
Selim Biçük
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884
Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robin Rewsen
46-8-7510564
Bonn:
Ahmet Baraçaklıç
49 228 66 62 49
Celle:
Wezir Saçik
49 50 52 87 36



Divê rêxistinê ji dewletê karkeran serbixwe bin

Tevgera karkeran wekî şaxên dewletêye din paşverû ye. Bi dîtina min ji bo demokratîkbûna Tirkîyeyê iro tevgara karkeran di warê çalakbûnê de li rêza herî dawîn e. Hin mesajên tirsonek hene. Lê ev ne hêjayî nirxandinê ne...

Me li ser nêziktêdayına çîna karkeran ji bo kêşeya kurdî dîtinê rewşenbîrê hêja Fikret Başkaya pîrsin, li ser vê mijarê birêz Başkaya tiştên gelek balkêş gotin. Em dîtinê wî pêşkêşî we dikin.

Li Tirkîyê tu car tevgereke serbixwe ya karkeran pêk nehat. Di sala 1936'an de "qanûna karkeran" derket, piştre di sala 1947'an bi qanûna sendikayan derket, di sala 1952'yan de TÜRK-İŞ ava bû û di sala 1963'yan de mafê peymana giştî hate na-sin. Bi van gavan re tevgera karkeran ji xistin bin bandora dewletê. Lewre jî rêxi-stina karkeran û sendikayan wekî hacetê ideolojîk ên dewletê kar kirin.

Jî bo ku çîna karkeran layiqî navê xwe be divê xwediyyê serbixwebûneke bîrdozî û tevgerî be. Ev yek ji bo karkeran tirk pêk

nehat. Ji ber vê sedemê ji li Tirkîyeyê sendikavanen iro, wekî karmendêن (mamûr) dewletê dixebeitin. Tev di nav sînorêni ideolojiya fermî de tevdigerin. Ev kesen ku di her warf li cem dewletê cih digirin nikarin ji bo kêşeya kurd tiştekî bikin. Kêşeya kurd ji bo van ne xem!

Tevgera karkeran wekî şaxên dewletêye din paşverû ye. Bi dîtina min ji bo demokratîkbûna Tirkîyeyê iro tevgara karkeran di warê çalakbûnê de li rêza herî dawîn e. Hin mesajên tirsonek hene. Lê ev ne hêjayî nirxandinê ne...

Jî bo nêzibûna karkeran kurd û tirk pêşî divê karkeran tirk gavan biavêjin. Ez hel-westa tevgera kurd erêni dibînim. Manzara iro ji berê ne xerabtir e. Lê, divê tevgera karkeran tirk cesûr û zelaltır tevbigere. Ev yek ji bo partiyê sosyalist yên heyî ji der-



bas dibe.

Di dema 12 rêzberê de bazariyên mezin li ser van aîdaten pêk hatin. Dema'ku dewletê qala birîna aîdatê kir, sendikavanen gotin vê yekê nekin. Wekî din hûn karin, her tişti bikin! Ev. koleyên ideolojîk yên dewletê ne!

alozi: tevlihevî
babet: mijar, dabaş (konu)
beteşe: bêhawa, bêşikil (biçimsiz)
bijşik: doxtor
bilêvkirin: telafûz
binirx: hêja (değerli)
bireser: nesne
cak: baş, qenc
çavkanî: jêderk (kaynak)
çewşiner: Zordar (baskıcı)
çîrisandin: bîriqandin (parlamak)
cîvaknas: sosyolog
erjeng: tîrsnak (korkunç)
endazyar: muhendis
gotar: maqale

Ferhengok

helbest: şîr
hest: dilin, hîs (duyu)
hevduyek: baqek (deste)
hêzên beşî: (kara kuvvetleri)
hişaza: azad, serbixwe
kêşê: pirşirêk (sorun)
kirde: kiryar (özne)
mak: dayık (dişi)
mebest: armancı, niyet
mîrmîşin: mîrîti (beylik)
mixabin: ci heyf (ne yazık ki)
nirx: hêjayî (değer)

nimînende: niwêner, nûner, (tamsilci)
paşgir: parkit
pend: şîret (ögüt)
pergal: sazûman, sistêm
peywir: wezîfe (görev)
peywîkar: wezîfedar
pîse: huner, meslek
sermezâri: nalet (kinama)
sermezarkirin: naletkirin (kinamak)
teşe: awa, şikil
tundraw: ekstrem, radikal (aşırı)
werqîlandin: rawestin, sekinandin
vegirtox: dagirker (ışgalci)
xwerist: xweza, surîş (doğa)

PKK bûye sembola nasnameya kurdî

Kêşeya kurdî, kêşeya terorê nîn e, lê kêşeya nasnameya kurdî ye. Ji bo fêmkirina kêşeya kurdî û rewşa gelê kurd, pêwistî bi çûna herêmê û axaftina bi gel re heye. Üntü got: "Heke em bi tenê meseleyê ji televizyonê bisopînin, emê di rastiyê negîhîjin, emê tenê bi kuştina "terorîstan" kîfawes û bi kuştina leşkeran xemgîn bibin."

Roja 30'ê avrêlê li Zanîn-geha Boğaziçi bi-sazû-mankariya Kuluba Têkili-yen Navneteweyî (UIK) panelek bi navê "Şerê ku nav lê nehatiye kirin: Başûrê Rojhîlat", hate lidarxistin. Kesên wekî A. Melik Fırat, Rojnameger Koray Düzgören, Mebûsê Partiya Refahê Fetullah Erbaş û ji Mazlûm-Derê Saliha Ünlü wekî axivger besdarî panelê bûn. Panel ji hêla spikerê Kanal-7'ye Ahmet Hakan ve hate birêvebirin.

Panelê bi axaftina Rojnameger Koray Düzgören dest pê kir. Düzgören li ser şerê qirêji û kêşeya kurdî gelek tişten balkêş gotin. Wî da zanîn ku şer rî li ser pêkhatîna aştiya civakî digire û zirareke mezin dide civakê. Her wiha Düzgören got ku ji sisiya yekê erdê Tirkîyeyê bi vî şerî rûxandin û şewitan-din.

Düzgören li ser gotina rayedarên tirk ên bi rengê "Me PKK têk bir û me hêza wê daxist radeya sala 1984'an" ji rawestiya û da zanîn ku ev gotin ne rast in. Rojnameger Koray Düzgören bi bîr xist ku pirsgirêkîn bi vî rengî, bi kuştin û azînîn leşkerî çareser nabin. Her wiha wî demokratikbûna Tirkîyeyê ji bi çareserbûna kêşaya kurdî ve girê da.

Koray Düzgören stratejiya artêşa tirk a nû ji rexne kir û diyar kir ku ar-

têş ji xwe re li dijminan digere. Li gorî dîtina Düzgören, wê ew strateji bibe sedemâ hinek aloziyan li Tirkîyeyê. Di dûmahîka axaftina xwe de Koray Düzgören disa vegeeria ser mijara "têkbirîna PKK'ê" û diyar kir ku PKK'ê bi zanatî hêza xwe ya çekdarî vedikişine, lewre ew dixwaze bibe hêzeke siyasî. Li gorî nirxandina Düzgören PKK'ê di vî warî de gîlek rî girtiye, bi taybetî li gelek welatên Ewrûpâyê û li Rûsyayê bûye xwedîyê bingehêke xurt, ji aliye gelek dewletan ve jî tê nasîn. Düzgören wekî nimûneyeke balkêş jî vexwendîna Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji hêla 150 mebûsên yewnanî ve nîsan da. Rojnameger Koray Düzgören da xuyakîrin ku PKK bûye hêzeke navneteweyî. Her wiha wî diyar kir ku PKK li Başûrê Kurdistanê bûye hêzek

lê niha gelê kurd di mijarêng bingehîn de nêzîkî hev bûye. Lewre jî rêveberen PKK'ê nabêjin ku ji bo çareseriyê divê hûn bi me re li hev rûnin, dibêjin bi kî re li hev rûdinin rûnin, lê tişten ku bêxwestin naguharin."



A. MELİK FIRAT



vaniya gel ji PKK'ê re heye, ew pişte-vaniy her diçê zêde dibe. Mirov; ci yên bawermend, ci ji yên bêbawerî (ne ol dar) PKK'ê wekî rûmeta xwe dibinin. Berê mirovan ji kurdbûna xwe şerm dikirin, bi kurdî nedipeyivîn, lê niha bi kurdbûna xwe serbilind in." Saliha Ünlü li ser mijara sembolîn dewleta tirk ji tesbîteke balkêş kir. Wê diyar kir ku gel hez ji sembolîn dewleta tirk, tişten wekî al, üniforma nake, lewre di bin wê alê de û di nav wê üniformayê de li gel zilm hatiye kirin.

Mebûsê berê û ronakbîre kurd A. Melik Fırat ji di peyivîna xwe de li ser xalîn girîng rawestiya. Wî da zanîn ku rayedarên dewleta tirk nîzanîn ci dîkin û got ku di navbera gelê kurd û tirk de tu arişê tûne, lê problem rayedarên dewletê ne. Fırat xwest ku hemû kesen bindest ci sosyalist, ci islamî û ci yên din giş li dijî çewsineran bibin yek.

Mebûsê Partiya Refahê Fetullah Erbaş ji di panelê de li ser kêşeya kurdî dîtinêng xwe anîn ziman. Li gorî Erbaş kurd û tirk di demê berê de-bî bando-ra ola islamî bêyî arişeya bi hev re ji-yane, pişte pirsgirêkî kurdî bûye pirsgirêka nasnameyi, hin caran ji wekî pirsgirêka lipaşmayına Başûrê Rojhîlat derketiye holê, lê pişti derketin PKK'ê bûye meseleya terorê. Li ser pirsekê Erbaş diyar kir ku bi efuya ku ew dixwazin derxin wê ji 56 hezar kesen girti, 42 hezar serbest bimînin.

Panelê bi qasî 3 demijmîran (sae-tan) kişand û li dora 300 kesî li axivgeran guhdarî kir.

NAVENDA NÜÇEYAN



SALİHA ÜNLÜ

sereke ku hêzîn başûrî ji êdî nikarin rî li ber wê bigirin. Wî wekî gaveke girîng di warê xurtbûna PKK'ê de jî, bîcîhbûna PKDW'ê li başûrê Kurdistanê destnişan kir.

Di dawiya axaftina xwe de Düzgören da zanîn ku dewlet di warê kêşaya kurdî de xitimiye û kêşeya kurdî her li cihê xwe ye. Rojnamegerê tirk piştre li ser piştevaniya ji bo PKK'ê jî ev tesbit kir: "Di salên 1990'î de ji sedî 15-20'ê gelê herêmê piştevaniya PKK'ê dikir,



KORAY DÜZGÖREN